ROJEVA
# Medya
12 Çile Pêncşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 63

## Emniyeta Amedê Serfermandarî derewand

Midûriyeta Polîsan a Amedê têkildarî encamên qedexeya derketinên derve yên di navebra 2015-2016'an de li navçeyên Sûr, Farqîn û Rezanê hatin îlankirin, nivîsek ji dadgehê re şand. Di navbera bîlançoya vê nivîsê û daneyên ku Serfermandariyê ragihandibûn de derket holê ku ferqeke pir mezin heye. Li gorî midûriyeta polîsan li sûrê 64 YPS'î, 66 leşker, polîs û cerdevanan jiyana xwe ji dest daye. Serfermandariyê jî îdia kiribû ku di operasyonan de 279 endamên YPS'ê "bê bandor" kirine...RÛPEL - 3

# Ew ne 'bêkes' in nirxên vî gelî ne



## POLÎSAN DU JINÊN CIWAN ÎNFAZ KIRIN

Polîsên dewleta tirk li Sêrtê li naverasta kolanê du jinên ciwan qetil kirin. Walîtiya Sêrtê li ser malpera xwe îdia kir ku her du jin endamên PKK'ê ne û di encama pevçûnê de hatine kuştin lê şahidên bûyerê walî derewand û da zanîn ku her du jinên ciwan li kolanê hatine înfazkirin. Li Sêrtê ji 2015'an û vir ve înfazên bi vî rengî tên kirin… RÛPEL - 3

## 52 CENAZE BI KORSANÎ VEŞARTINE

52 cenazeyên aîdî endamên YPS û YPS-Jinê yên li Gevera Colemêrgê piştî qedexeya derketina derve ya di 12'ê adara 2016'an de hat îlankirin û di pevçûnan de jiyana xwe ji dest da, ev nêzî salekê ye li goristana bêkesan li benda wergirtinê ne. Li gel ku malbatan ji bo wergirtina cenazeyan mînaka xwînê daye jî cenaze nayên teslîmkirin...

## JI VÊ HOVÎTIYÊ RE BÊ DENG NEMÎNIN

58 cenazeyên şervanên YPS û YPS Jinê yên li Nisêbîna Mêrdînê şehîd ketibûn jî dîsa li goristana bêkesan hatine definkirin û heman eziyet li malbatan tê kirin. Malbatan bang li raya giştî kir ku ji vê hovîtiyê re bê deng nemînin û dengê xwe bilind bikin. Ne tenê li Erziromê, li Amed, Şirnex, Rihayê jî cenaze li goristanên bêkesan hatine definkirin… RÛPEL - 3

# PDK parçe dike

### Li gel ku kurd tevî hemû saziyên xwe dixwazin kongreya neteweyî li dar bixin jî PDK radibe wekî hikumeta AKP'a tirk tev digere û hewl dide kurdan ji hev parçe bike

## WEKÎL BINÇAV KIRIN

Hikumeta AKP'ê li dijî siyaseta demokratîk a kurd bi kîjan rêbazan tev digere wekî ku PDK dixwaze jê kêm nebîne heman rêbazên qirêjî bi kar tîne. Asayîşa PDK'ê wekîlên Tevgera Goran û Komala Îslamî binçav kirin, piştî nerazîbûna gelê kurd ew berdan lê nehiştin wekîl bikevin Hewlêrê.

## ŞIRÎKATIYA BÊYOM

Partiyên kurd li dijî vê helwesta dijminane bertekeke tund nîşan da û diyar kir ku PDK wekî partiyeke kurdistanî tev nagere û li gorî berjewendiyên xwe tev digere. Partiyan di daxuyaniyên xwe de helwesta PDK'ê ya li dijî PKK'ê û şirîkatiya wê ya bêyom a bi hikumeta tirk re jî şermezar kirin...RÛPEL - 7



### ÎRO NEBE KENGÎ?

Nivîskarên kurd Rênas Jiyan, Îrfan Babaoglu û Azad Zal xwest kurd êdî bi kongreyekê bibin yek û helwesta dijber a PDK'ê rexne kir.

### PKK NE TERORÎST E

Hevserokê Tevgera Azadî Mihemed Abdullah got ku ew qebûl nakin ku hikumeta tirk ji PKK û PYD'ê re bibêje terorîst.

### EV SEDSALA ME YE

Siyasetmedarên kurd ên li Îzmîrê jî ji bo yekitiyê bang li hêzên kurdistanî kir û wiha got: "Ev sedsal a kurdan e divê winda nekin."

### ÊRÎŞÊN LI SER CIVAKÊ


Di çalakiyên ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de jî hat diyarkirin ku dem dema yekitiya hemû kurdan e...RÛPEL - 7



## Du baskên HSD'ê gihaştin hev

Pêngava Xezeba Firatê derbasî qonaxeke nû bû. Baskên Eyn Îsa û Qadirîyeyê ku di qonaxa duyemîn de ketin nav tevgerê, li gundê Kermancoyê gihaştin hev. Bi vî awayî HSD'ê di pêngavê de hêzên xwe jî kirin yek...

Medya Rûpel - 5



## TAK'ê çalakiya Îzmîrê pêk aniye

TAK'ê li ser malpera xwe çalakiya li Îzmîrê girt ser xwe û da zanîn ku çalakî ji aliyê Tîma Tolhildanê ya Şehîd Çekdar ve hatiye kirin. TAK'ê da zanîn ku hemû sazî û dezgehên dewletê di hedefa wan de ne...

Medya Rûpel - 3



## Rewş ji krîzê jî derbastir bûye

Polîtîkayên şer ên dewleta tirk di warê aborî de jî welat ber bi têkçûneke mezin ve dibin. Dolar ber bi 4 TL'yî ve diçe. Saziyên navdewletî puanên Tirkiyeyê dixin. Aborînas dibêjin şer bidome dê Tirkiye topê biavêje...

Medya Rûpel - 6

## Ax yekitî ax yekitî... Nivîsa Nalîn Dîcle

R7

## Sîlîvrî de polîtîkayê Îmrali estî

Hemserekê TUADÎ Arîf Yılmazo ke Hepisxaneyê Sîlîvrî ra tehlîye bîbî, derheqê zext û tedayê ke hepisxaneyan de benî de qisey kerd û wina va: "Bitaybetî Hûmara 9î ya Sîlîvrî de polîtîkayê Îmrali erzîyayî dewre." ... RÛPEL - 11

## Dozgerî ra qerarêko ecêb!

Cinîya bi nameyê Fehîmeya ke çend rojî verê bi îdîaya medyaya komelkî ser ro çîyan pare kerdo ameybî tewqîfkerdiş, vejîya orte ke dayîke Fehîme wendiş û nuştiş nêzana û medyaya komelkî ra zî çîyêk fam nêkena... RÎPEL - 11



## Ev wêneyê welatheziyê ye

Malbata Aykut a mala wan di qedexeya derketina derve ya li Geverê de ji aliyê hêzên dewletê ve hat hilweşandin, axa xwe terk nekir. Malbatê odeyeke malê ji nû ve çêkir û dilê xwe nebijand jiyana li xeribistanê... RÛPEL - 3

www.arsivakurdi.org

Jin
12 Çile 2017 Pêncşem

# Rojnamegera şer jiyana xwe ji dest da



**NÛÇEGIHANA ŞER A ÎNGILÎZ CLARE HOLLINGWORTH** li Hong Kongê di 105 saliya xwe de jiyana xwe ji dest da. Clare rojnamegera ku Şerê Duyemîn ê Cîhanê ku di sala 1939'an de bi dagirkirina Polonyayê ji hêla naziyan ve dest pê kir, cara yekê ji cîhanê re ragihandiye. Clare di sala 1911'an de li Leicestera Îngilistanê hatiye dinê, Li Vîetnam, Cezayîr û li Rojhilata Navên nûçegihaniya şer kiriye. Clare beriya bibe rojnameger vîzeya îngilîz eyar kir û ji bo bi hezaran kes ji leşkerên nazî yên Almanyayê birevin bû alîkar ev 40 sal bû ku jiyana xwe li Hong Kongê berdewam dikir û di sala borî de 105 saliya xwe pîroz kiribû. AMED

## Çalakî didomin



Bi armanca şermezarkirina Komkujiya Parîsê, ku şoreşgerên kurd Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez lê hatin kuştin, li bajarê Heîlbronn ê Almanyayê mîtîngek hat lidarxistin. Mîting ji aliyê Meclisa Jinan a Sevê Demîr ve hat organîzekirin û endamên MLPD'ê jî tev lê bûn. Ji bo bîranîna her sê şoreşgerên kurd fînd hatin vêxistin û dewleta tirk hat şermezarkirin. Her wiha bang li Fransayê jî hat kirin ku hêzên di nava komkujiyê de cih girtine, aşkera bike. Ji nûnerên Tevgera Jinên Kurd li Ewropayê Delal Rûber li vir axivî û wiha got: "Di serî de jinên kurd, wek hemû jinên şoreşger ên cîhanê, heta ronîbûna vê komkujiyê em ê tê bikoşin. Em ê xwedî li mîrateya wan derkevin." HEÎLBRONN

## HPC-Jin yekemîn dewreya perwerdeyê ji bo jinan vekir



Li ser daxwaza jinên bajarê Qamişloyê ji bo fêrkirina bikaranîna çekan, Akademiya HPC-Jin yekemîn dewre dest pê kir. 60 jinên bajarê Qamişlo tev li perwerdeyê bûn. Dewreya perwerdeyê ku dê du rojan dewam bike roja yekemîn dê jin li ser vekirina çekan perwerde bibin û roja din jî dê li ser çawayîna avêtina guleyan perwerde bibin. Di destpêka perwerdê de Rêvebera Yekitiya Jinên Ciwan a bajarê Qamişlo Zinarîn Tolhildan girîngiya parastinê, girîngiya perwerdeya li ser çekan û parastina rewa axivî. Piştî ku perwerd bi dawî bibe dê jin bi saetên êvarê parastina taxên xwe bikin. QAMIŞLO

## Silav hat bibîranîn



Malbata gerîlaya YJA Starê Şevîn Coşkûn (Silav Mazda Mariya) li bajarê Essen ê Almanyayê serdanên sersaxiyê pêşwazî kirin. Komeleya Xizmên Şehîd û Windayan (KOMAW) û Navenda Civaka Demokratîk a Kurd li Essenê daxuyaniyek dan û diyar kirin ku di 15'ê çileyê roja yekşemê li navnîşana An der Knippenburg 115, 46238 Bottrop dê ji bo gerîla Silav çalakiyeke girseyî ya bîranînê bê lidarxistin. ESSEN

# 'Rêber Apo ji bo mirovahiyê şansek e'

Gerîlayên YJA Starê tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û ev tişt anîn ziman: "Em tecrîda girankirî qebûl nakin. Çalakiyên me yên li dijî tecrîdê dê bi her awayî berdewam bikin."

Z.NÊRGIZ BOTAN - DÎDAR KATO / BEHDÎNAN - ANF





Gerîlayên YJA Starê têkildarî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku ev 18 sal e tê meşandin, axivîn. Gerîlaya YJA Starê Havîn Bêrîtan diyar kir ku ew ji ber êrîşên li ser Rêberê Gelê Kurd û gelê kurd tev li PKK'ê bûye. Bêrîtan da zanîn ku azadiya gelê kurd bi azadiya Rêbertiyê ve girêdayî ye û wiha got: "Têkoşîna me dê her tim li ser vê bingehê be. Wek gerîlayeke YJA Starê, hem ji bo bersivê bidim êrîş û hovîtiya dewleta tirk, bi hemû hêza xwe tev li pêvajoyê dibim. Bang li ciwanên kurd ên li çar parçeyan dikim. Heke hûn dixwazin gelê me û Rêberê me azad bibe, tev li nava refên gerîla bibin. Bi rastî jî têkoşîn li nava refên gerîla tê dayîn. Ku em dixwazin sala 2017'an bibe sala serketinê ya Rêberê me û gelê kurd, lazim e em hemû tê bikoşin."

Bêrîtan Gernas jî destnîşan kir ku bersiva herî mezin a ji bo nirxên ji destê gelê kurd hatine girtin, tevlîbûna nava PKK'ê bû û ev tişt anî ziman: "Di kesayetiya xwe de min gelek guhertin pêk anîn. Min ev yek bi PKK'ê kir. Zexteke giran li ser Rêberê me heye. Rêberê me ne tenê rêberê gelê kurd e yê tevahiya gelên cîhanê ye. Felsefe û îdeolojiya wî bersivê dide hemû gelan. Bi dîtina min Rêberê me şenseke ji bo mirovahiyê. Plan li dijî Rêberê me tê kirin, ev rewş nayê qebûlkirin. Bersiva herî mezin a li van planên dewleta tirk, tevlîbûna li nava gerîla ye. Bi vê têgihiştinê tev li nava jiyana PKK'ê dibim. Bersiva me ya herî mezin jî çalakiyên me ne. Ger em naxwazin li pêşberî dîrokê hesab bidin, divê em erka xwe bi cih bînin."

## Ew xeta me ya berxwedan û jiyana azad e

ZINARÎN ZINAR / BEHDÎNAN - ANF

**GERÎLAYÊN YJA STARÊ** têkildarî sê jinên şoreşger Sara , Rojbîn û Ronahiyê nêrînên xwe anîn ziman. Gerîlaya YJA Starê Toprak Canfeda diyar kir ku di kesayeta van hevalan de hat xwestin ku li ser tevgera jinan û li ser Rêbertiyê komplo were kirin û got ku ew ê wek tevger tola vê komployê bi têkoşîna azadiya jinan û bi rêka heqîqetê hilînin. Canfeda banga têkoşînê li her kesî kir. Stêrk Dîrok da zanîn ku ew roja 9'ê Çileyê lanet dike û got ku piştî şahadeta her sê jinên şoreşger tev lê bûye û wiha got: "Wek jinekê; ji bo xewn û xeyala hevalan û bi hezaran şehîdên me yên di rêka azadiyê de tê koşiyan û şehîd bûn, bi cih bînim tev li nav refê gerîla bûm." Ekîn Viyan bi lêv kir ku ew ê teqez bersiva pêwîst bidin komplogeran. Gulaber Sîverek jî destnîşan kir ku divê teslîmiyet tu carî neyê qebûlkirin û roja wan bi têkoşîn û sekna wan watedar e û got ku ew careke din sonda azadiyê dubare dikin.

# Cîhan Şêx Ehmed:
# Em tola jinên cîhanê hiltînin

MAHÎR YILMAZKAYA / REQQA - ANF

Berdevka Odeya Çalakiyan a Pêngava Xezeba Firatê Cîhan Şêx Ehmed li ser Pêngava Xezeba Firatê axivî. Şêx Ehmed diyar kir ku di çarçoveya qonaxa duyemîn a pêngavê de heta niha gelek bajarokên mezin, bi dehan gund, bi sedan gundik û girên stratejîk ên li rojavayê Reqqayê ji çeteyên DAIŞ'ê hatine paqijkirin.

Cîhan Şêx Ehmed diyar kir ku pêngava wan bi lez û bez û serkeftî berdewam dike, gav bi gav dorê li navenda Reqqayê digirin û wiha got: "Dikarim bibêjim ku navenda bajarê Reqqayê êdî di menzîla şervanên me de ye. Şervanên me, tevî şert û mercên giran ên zivistanê jî bi fedakariyeke mezin ber bi dilê çeteyên DAIŞ'ê Reqqayê ve diçin."

Cîhan Şêx Ehmed da zanîn ku çeteyên DAIŞ'ê di bin navê Îslamê de di asta herî bilind de barbariyê dikin û wiha axivî: "Vê yekê li dijî tevahiya mirovahiyê dike. Lê belê bi taybetî dixwaze jinan tune bike. Ji ber ku jin bingeha mirovahiyê ne. Li Reqqayê îşkence, komkujî û destavêtin li jinan tê kirin. Bi rêbazên ji yên serdema navîn dijwartir, jin tên kolekirin û firotin."

Cîhan Şêx Ehmed revandina bi sedan jinên êzidî ji Şengalê bi bîr xist û anî ziman ku çeteyên DAIŞ'ê ev jin anîn Reqqayê, li bazaran firotin û destnîşan kir ku ev zîhniyet û çeteyên DAIŞ'ê hê jî gefan li hemû jinan dixwin. Cîhan Şêx Ehmed destnîşan kir ku li dijî vê êrîş û kolekirina jinan, jinan bi rengekî çalak cihê xwe di nava pêngavên Şeddadê, Şehîd Rûbar Qamişlo, Minbic û gelek pêngavên din de girt. Cîhan Şêx got ku jin bi gavên dîrokî bi ser tarîtiyê de diçin û ev peyameke gelekî girîng e û di heman demê de pêngava Xezaba Firatê ji bo jinan pêngaveke dîrokî ye û ev pêngav jî bi fermandariya jinan tê meşandin. Cîhan Şêx destnîşan kir ku navekî din ê Pêngava Xezeba Firatê 'Pêngava Hilanîna Tola Jinên Cîhanê' ye.



# 'Ez dixwazim êrîşkar bê cezakirin'

Di 4'ê Çileyê de li navçeya Etîmesgutê ya Enqereyê ajokarê otobusa şaredariyê ê bi navê S. li dijî jinan êrîşa zayendî pêk anîbû. S. serpêhatiyên xwe ji nivîskara Hurriyetê Ayşe Arman re parve kir. S. got ku wê rojê hewa pir sar bû û xwest li otobusê siwar bibe û wiha got: "Ez mamosteya îngilîzî me. Wê rojê heta saet 22.30'an vegeriyam malê. Ji ber ku hewa sar bû ez nemeşiyam û li otobusê siwar bûm. Otobus li rawestgeha ku ez lê daketim ranewestiya. Piştî ajokar otobus sekinand xwe avêt stûyê min û êrîşa zayendî pêk anî. Min xwe avêt bextê wî û min jê re got ez vê yekê ji tu kesî re nabêjim. Piştî vê yekê ajokar ez berdam. Piştî ku ez berdam, hatim malê û min agahî da polîsan. Min otobusên şaredariyê ewle dizanîn. Ez ji xwe pir aciz im. Xwezî ez li taksiyê siwar bibûma."




S. anî ziman ku ew pir êşê dikêşe û wiha axivî: "Min wê demê xwest bimirim. Xwezî ez bimirama. Piştî vê yekê her dem digirîm. Pir xemgîn im. Pir bi hêrs im. Wekî qusûra min hebe şerm dikim. Gelek kes piştgiriyê didin min. Lê dîsa ez xwe bi tenê hîs dikim. Ez xwe pir xerab hîs dikim." S. da zanîn ku ajokarê otobusê derewan dike û dibêje "Bi rizaya wê bû" û ev tişt anî ziman: "Tişta ku ez dixwazim bi tenê ew e ku ajokarê êrîşkar bê cezakirin." ENQERE

www.arsivakurdi.org

# 52 gorên ‘bêkesan’

**52 cenazeyên aîdî kesên li Gevera Colemêrgê jiyana xwe ji dest dabû û li Erziromê li goristana bêkesan ji aliyê dewletê ve hatin definkirin, ev nêzî salekê ye li benda wergirtinê ne**

52 cenazeyên aîdî şervanên YPS û YPS-JIN'ê yên li Gevera Colemêrgê piştî qedexeya derketina derve ya di 12'ê Adara 2016'an de hat îlankirin û di pevçûnan de jiyana xwe ji dest da, ev nêzî salekê ye li goristana bêkesan li benda wergirtinê ne. 52 cenazeyên hatin diyarkirin ji bo otopsiyê anîne Erziromê û paşê hatine definkirin, nayê zanîn aîdî kê ne.

Piştî karên otopsiyê, di belgeya di navbera Saziya Tiba Edlî ya Erziromê û rayedarên Midûriyeta Gorên Şaredariya Bajarê Mezin de hatibû îmzekirin de hejmar û cihê definkirina cenazeyan hatibû tevlihevkirin û li gel ku malbatan nimûneya DNA'yê daye jî cenaze radestî wan nayên kirin.




52 cenazeyê di dîrokên cuda de hatin definkirin, li beşeke Goristana Abdurrahman Gazî ya li dûrî navenda bajêr e, hatine definkirin. Goristana ku bi hezaran cenaze lê hatine definkirin, 52 gorên "bêkesan" di nav hev de ne.

**TENÊ 22 XUYA DIKE**

Ji ber berfa ku heta çongekê ketiye, ji gorên li kêleka hev in û ji yekê heta 52’yan hatine nîşankirin, tenê gorên bi hejmara 52 û 21'ê tên xuyakirin. 52 cenazeyên li goristana li ser girekî hatine definkirin, li benda wergirtinê ne. *ERZIROM - DÎHABER*

# AKP’ê du jinên kurd înfaz kirin!



Piştî ku AKP pêvajoya çareseriyê ji holê rakir û li hemberî kurdan şerê ji salên 90’î xirabtir da destpêkirin, înfazên li hemberî kurdan jî dest pê kirin. Bi OHAL’ê re AKP li bajarên Kurdistanê, jin, zarok û ciwanan înfaz dike. Herî dawî jî li Sêrtê înfaz pêk anî. Li taxa Çal a Sêrtê polîsan bi ser malekê de girtin û di serdagirtinê de 2 jinên ku navê wan nehat zanîn jiyana xwe ji dest dan. Der barê bûyerê de walîtiya Sêrtê daxuyaniyek da û diyar kir ku jinên hatine kuştin PKK’î ne û îdia kir ku amadekariyên êrîşê dikirin.

Şahidên bûyerê jî daxuyaniya walitiyê derewandin û diyar kirin ku herdû jin ne li malê li kolanê hatine kuştin. *SÊRT - DÎHABER*



## TAK'ê çalakiya Îzmîrê girt ser xwe

Çalakiya ku di 5'ê çileyê de li Îzmîrê pêk hat, Teyrê Bazên Azadiya Kurdistanê (TAK) girt ser xwe. Di çalakiyê de polîs û mubeşîrekî jiyana xwe ji dest dabû. TAK'ê di daxuyaniya xwe de wiha got: "Yek ji bajarên aram, ewle, tûrîzm û bazirganiyê' li Îzmîrê ji derb xwar, mêtingeriya TC û rêveberiya AKP'ê ya faşîst ku li pêşberî çalakiyên me li ber şikestinê ne, bi rêya şerê taybet ê psîkolojîk hewl dide birînên bi çalakiyên me vebûne, binixumînin. Lê ev hewldanên wan bêkêr in. Divê êdî raya giştî û gelê me zanibe, sîstema faşîst a li erdê rast bûye û medyaya wê, hewl didin derba giran, bi dehan miriyên xwe û travmaya dijî veşêrin." TAK'ê da zanîn ku çalakiyê endamê wan Mustafa Çoban (Zerdeşt Rustem Erdal) ê ji Elbistana Mereşê û Enes Yildirim (Pîrdogan Ararat) ê ji Panosa Agiriyê ev çalakî pêk anîne. **ÎZMÎR - DÎHABER**

## 22 roj in di bin çavan de ne

Li Qeyseriyê di 17'ê kanûnêde li dijî otobusa leşkeran êrîş pêk hatibû. Di êrîşê de 14 leşkeran jiyana xwe ji dest dabûn û 56 leşker birîndar bûbûn. Piştî bûyerê TAK'ê çalakî li xwe girt û diyar kir ku endamê wan Kasim Yildirimçakar ê ji navçeya Qelqeliya Wanê pêk anîye. Piştî bûyerê 22 roj berê polîsan bi ser malbata dayik û bavê wî de girtin. Polîsan dayika wî Hurriyet (46) û bavê wîe Îsmail Haki Yildirimçakar (49) binçav kirin.

Dayik û bav 22 roj in di bin çavan de tên girtin. Hat zanîn ku dayik û bav piştî hatin binçavkirin birin Midûriyeta Polîsan a Qeyseriyê û li Şaxa TEM'êya Qeyseriyê tê girtin. **WAN - DÎHABER**

## Zarok li benda dayika xwe ne

Du zarokên Endama Meclisa Şaredariya Yenîşehîrê Turkan Uzan Avşîn a girtî, Robîn û Egît bi hêviya azadbûna dayika xwe çav li rêya dayika xwe mezin dibin. Hevjînê Avşîn Mehmet Avşîn ku di nava mercên zehmet de li zarokên xwe dinêre, anî ziman ku ew êdî nikare zarokên xwe bixapîne.

Bav Avşîn ku di Şaredariya Yenîşehîrê de dixebitî, piştî qeyûm hat ser şaredariyê Avşîn jî ji kar tê derxistin. Avşîn da zanîn ku zarokên wî mehê 3 rojan di girtîgehê de bi dayika xwe re diman û piştî ew ji kar hat derxistin nikarin biçin hevdîtina girtîgehê jî.

*AMED - DÎHABER*



## Bîlançoya derew

Midûriyeta Polîsan a Amedê têkildarî encamên qedexeya derketinên derve yên di navebra 2015-2016'an de li navçeyên Sûr, Farqîn û Rezanê hatin îlankirin, nivîsek ji dadgehê re şand. Di navbera bîlançoya vê nivîsê û daneyên ku Serfermandariyê ragihandibûn de derket holê ku ferqeke pir mezin heye. Di nivîsê de hat bibîrxistin ku li 15 taxên navçeya Sûrê bi giştî 106 rojan "qedexeya derketina derve" dewam kiriye û niha li hin taxan bi awayekî qismî qedexe didome. Di nivîsê de hat diyarkirin ku li herêmê rojê 450-500 leşker beşdarî operasyonê bûne. Her wiha nehat diyarkirin ku bê çend cerdevan beşdarî operasyonê bûne. Li gorî midûriyeta polîsan li sûrê 64 YPS'î, 66 leşker, polîs û cerdevanan jiyana xwe ji dest daye. Di nivîsê de nehat diyarkirin ku ji ber pevçûnan çend sivîlan jiyana xwe ji dest daye.

Hat diyarkirin ku di nav 67 kesên wek "mensûbên rêxistinê" û teslîm bûne hatin derpêşkirin de, 10 zarokên ku temenê wan ji 12 saliyê biçûktir cih digirin û ev zarok teslîmî SHÇEK hatine kirin. Di nivîsê de nehat diyarkirin bê ka xisara navçeyê çi qas e. Li Sûrê, ji 2'yê kanûna 2015'an heta meha adarê bênavber oprasyonan berdewam kir û bi giştî 17 tabûr leşker teqwiyeyî navçeyê hatin kirin. Serfermandariyê di 10'ê Adarê de di malpera xwe de daxuyandibû ku li navçeyê operasyon bi dawî bûne û îdia kiribû ku di operasyonan de 279 endamên YPS'ê "bê bandor" kirine. Midûriyeta Polîsan a Amedê jî diyar kiribû ku di pevçûnan de 64 endamên YPS'ê jiyana xwe ji dest daye, ji 357 kesên hatin zeftkirin 75 jê hatine girtin. Di pevçûnên li navçeya Sûrê de li gel leşker, polîs û YPS'iyan jin û zarok jî di nav de gelek sivîlan jiyana xwe ji dest dabû. Li gorî daneyên MEYA-DER'ê, li navçeyê sivîl jî di nav de herî kêm 62 cenaze hatine derxistin. Li bajêr, di protestoyên ji bo Sûrê de jî herî kêm 11 kes hatin qetilkirin. *AMED – DÎHABER*

# Di odeyekê de jiyaneke berxwedêr

Li gundê Mexsûdava yê navçeya Gevera Colemêrgê Malbata Aykut a mala wan di qedexeya derketina derve ya li Geverê de hat hilweşandin, axa xwe terk nekir, odeyeke malê ji nû ve ava kir û 6 kes li vir dijîn. Endamê malbatê Hamza Aykut diyar kir ku li gel ku li gundê wan pevçûn tune bûye jî malên gundiyan ji aliyê tîmên taybet ve hatine hilweşandin. Aykut anî ziman ku ew bi xwedîkirina 5 mihan jiyana xwe berdewam dikin û banga piştgiriyê kir.



Hevjîna Hamza Zeynep Aykut jî bal kişand ser pêvajoya xerakirina mala wan û hestên xwe wiha anî ziman: "Ji bo ku ev mal bê avakirin ez di dehan karan de xebitîm. Heta ku me mal ava kir, jiyana me nîvî çû lê tîmên taybet mala ku me bi karê salan ava kir di nav çend saetan de xera kir. Em ê axa xwe neterikînin, dê dîsa hemû gundî bên û malên xwe ji nû ve ava bikin." *COLEMÊRG - DÎHABER*

## Îşkenceya 'girêka paşpêkî' pêk anîn

Di girtîgehan de zextên li ser girtiyên siyasî zêde dibin. Yek ji van girtîgehan jî Girtîgeha Tîpa T a Wanê ye. Endamê Platforma Hiqûqnasên Azadîparêz Umit Dede, çavdêriyên xwe yên li ser Girtîgeha Tîpa T a Wanê parve kirin û diyar kir ku li girtîgehan îşkenceya "girêka paşpêkî" ji nû ve dubare dibe û wiha got: "Muwekîlê min Ferit Hasçelek di îşkenceya "Domuz bagi" re derbas kirine. Dest û piyê wî li pişt wî girêdane û lê dane. Ew bê parastin û kontrol hiştine. Berê di îşkenceya hîzbûllahê de rêbaza "Domuz Bagi" bi kar dianîn. Muwekîlê min 2 caran ji ser hişê xwe çû. Di heman rojê de ji Girtîgeha Sêrtê jî 30-32 girtî hatine sewqkirin." **WAN**




## 'Feraseta dewletê qet neguherî ye’

Li Îzmîrê, Nerîman Ay (61) a di salên 90'î de bi awayekî giran rastî îşkenceya polîsan hat û di dema vê îşkenceyê de guhê wê yê çepê ker bû, diyar kir ku 24 sal e feraseta dewletê qet neguheriye û got ku dema wê li Silopiyê bedena Dayika Taybetê ya bi rojan li nav kuçeyan hat hiştin dîtiye, careke din ew êşên 24 sal berê hîs kirine. Ay anî ziman ku di salên 90'î de ew teslîm nebûne û ew bi têkoşînê hatine roja îro. **ÎZMÎR**



## Cenazeyê Kasar dan malabata wî

Welatiyê bi navê Muslum Kasar ê ku di êrîşa li dijî Midûryeta Polîsan a Dîlokê de hat kuştin, hat zanîn ku ji malbatek koçber a Sêrtê ye û rapora "ji sedî 50 aqilê wî ne li serê wî ye" ji aliyê nexweşxaneyê ve jê re hatiye dayîn. Piştî bûyera ku polîsek birîndar bû û Kasar jiyana xwe ji dest da gotibûn "êrîşa terorîstiye" û li derdora midûryetê xebat hatibûn destpêkirin. Cenazeyê Kasar ê rakirin morga Saziya Tiba Edlî ji aliyê bavê wî Musa Kasar ve hat teşhîskirin. **DÎLOK**



## Li Nisêbînê sazbendên betal

Domên (sazbend) li Nisêbînê yên li dawetan sazbendiyê dikin û bi vî awayî debara xwe dikin, piştî qedexeyan ji ber ku dawet êdî nayên kirin, betal man. Ayten Engîn a ku pirsa 'li cihekî ku xwîn lê birije dê çawa dawet bên kirin' wiha got: "Em dixwazin li mala xwe ya serobero, bêyî kes daxilî me bibe bijîn." Hadat Engîn ê ji 7 saliya xwe ve li ribabê dixe, anî ziman ku qedexe tu aramî li navçeya wan nehiştiye û got ku di nav kavilên avahiyan de dê dawet neyên kirin û wiha axivî: "Li Nisêbînê berê mirovan debara xwe dikir, kar pir bû, me pere qezenc dikir. Lê ji ber qetlîama ku hat kirin tu kes naxwaze dawetê bike." **MÊRDÎN**



www.arsivakurdi.org


## Însiyatîfa dijberî Glifosatê hat nasîn

**ÎNSIYATÎFA** Welatiyên Ewropa ya li dijî dermana Glifosat ku li welatên Ewropayê di qada çandiniyê de tê bikaranîn û bandora wê ya li ser tenduristiyê gelekî tê nîqaşkirin, ji aliyê Komîsyona Yekitiya Ewropayê (KYE) ve bi awayekî fermî hat nasîn. Hat ragihandin ku dê însiyatîf di 25'ê çileyê de bê tomarkirin û daxwazên wê ji aliyê komîserên YE'yê ve bên nîqaşkirin. Her wiha tomarkirina însiyatîfê nayê wateya qedexekirina dermanên di qada çandiniyê de tên bikaranîn. Li aliyê din hat diyarkirin ku li ser Glifosatê lêkolîn hatiye kirin û derketiye holê ku Glifosat dibe sedema nexweşiya pençeşêrê. Ji bo însiyatîfek bê tomarkirin û di nav 3 mehan de bersiva daxwazên wê bê dayîn, divê li 7 welatên YE'yê milyonek îmze berhev bikin. **BRUKSEL**



# Tevlîbûna kurdan şert e

**Mark Toner der barê tevlîbûna kurdan a ji bo çareseriya aloziya Sûriyeyê de axivî û diyar kir ku divê kurd jî wekî hemû gelê Sûriyeyê li dora maseya hevdîtinan de cih bigirin**



Amerîka di polîtîkaya xwe ya tevlibûna kurdan a civînên der barê Sûriyeyê de çerx kir û cara yekemîn xwest ku kurd tev li civînên der barê çareseriya Sûriyeyê de bibin. Heta niha der barê çareseriya aloziya Sûriyeyê de bi pêşengiya Amerîkayê gelek civîn hatine lidarxistine û kurd ji bo van civînan nehatine vexwendin. Bi nêzikbûna civîna Astanayê re Amerîka der barê tevlibûna kurdan de daxuyaniyeke balkêş da û xwest ku kurd li dora maseya hevdîtinan a Sûriyeyê amade bin.

**BÊYÎ KURDAN NABE**

Berdevkê Wezareta Karên Derve yê Amerîkayê Mark Toner di civîna çapameniyê ya rojane de axivî û der barê çareseriya aloziya Sûriyeyê de ev tişt anî ziman: "Divê komên di nav pêvajoyê de ne û gelê Sûriyeyê biryarê bidin ku k tevlî hevdîtinan bibin. Eger pêwîstî bi eşkerekirina pozîsyona me hebe; mîna hemû Sûriyeyiyan divê Kurd jî li dora vê maseyê hebin."

Toner di berdewama daxuyaniya xwe de destnîşan kir ku ji bo beşdarbûna PYD'ê ya civînan ew bi endamên din ên Koma Piştgiriya Navnetewî ya Sûriyê (ISSG) re hevdîtinan dikin û wiha got:"Em nirxandineke rastîn li ser daneyan bikin, YPG hêzeke li ser erdê ya xwedî temsîliyet e û ji bo çareseriyeke berdewamî ya Sûriyê pêwîst e dengê wan jî bê bihîstin. Ji bo Sûriyeyeke demokratîk, ev yek li gorî ruhê pêvajoyê ye ku rê li ber derbasbûneke polîtîk a ji aliyê hemû sûriyeyiyan ve bê qebûlkirin." ***WASHINGTON***

## Ban Ki Moon spasiya Celal Talebanî kir

Sekreterê giştî yê berê yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Ban Ki Moon ji bo Serokomarê Iraqê yê berê û Sekreterê Giştî yê YNK'ê Celal Talebanî nameyek şand.

Li gorî malpera fermî ya YNK'ê Ban Ki Moon di nameya xwe de spasiya Celal Talebanî kiriye û ev tişt gotiye: "Ez bi germî malavayî û spasiya we dikim ku we bi hevkariyeke nêzîk alîkarî û piştgiriya Neteweyên Yekbûyî kir û we di heman demê de piştevaniya karên me yên taybet kir."

Ban Ki Moon di nameya xwe de destnîşan kiriye ku ew ji ber serdan û nasîna xwe ya Talebanî gelekî kêfxweş e. Her wiha Ban Ki Moon di nameya xwe de qala têkoşîna li dijî DAIŞ'ê jî kiriye û ev tişt aniye ziman: "Têkoşîna gel û hikumeta Iraqê ya li dijî DAIŞ'ê ez matmayî hiştim. Ez ji dil daxwaz dikim ku pêkhateyên Iraqê piştî bidawîbûna DAIŞ'ê bibin xwediyê derfetên hê baştir." ***BRUKSEL***

## Lihevkirina Başîkayê derew e

Qeyrana di navbera Tirkiye û Iraqê de ya ji ber dagirkirina Tirkiyeyê ya li ser baregeha leşkerî ya Başîkayê, li gel serdana serokwezîrê Tirkiyeyê Bînalî Yildirim a Bexdayê jî nehat çareserkirin.

Piştî serdanê ji aliyê Tirkiyeyê ve hat ragihandin ku di mijara Başîkayê de bi Iraqê re li hev kirine û têkiliyên xwe bi Iraqê re bi pêş dixin.

Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî bi daxuyaniyekê daxuyaniya Tirkiyeyê derewand û got ku wan ji Tirkiyeyê re gotiye leşkerên xwe ji Iraqê vekişînin.

Ebadî der barê serdana Yildirim de daxuyaniyek da û wiha got: "Di civîna li gel serokwezîrê Tirkiyeyê Bînalî Yildirim de me got, heya Tirkiye hêzên xwe ji Iraqê venekişîne dê tu pêşketin di têkiliyên di navbera wan de pêk neyên. Ji ber vê yekê pêwîst e Tirkiye hêzên xwe ji xaka Iraqê vekêşe." ***BEXDA***



## Moşekên S-400 li Moskovê dest bi wezîfê kir



Moşekên S-400 li paytexta Rûsyayê dest bi wezîfeya parastina asîmanî kir. Asîmanê Moskovê dê ji niha şûnde bi moşekên S-400 bê parastin. Wezareta Parastinê ya Rûsyayê der barê bicihkirina moşekan de daxuyaniyek da û ragihand ku pergala parastina moşekên Triumf a S-400 dest bi wezîfeya parastina asîmanê Moskovê kiriye.

Di berdewamiya daxuyaniya wezaretê de hat gotin ku Hêza Hewayî ya Rûsyayê pergala parastina moşekên Triumf a S-400 ku ji bo herêma Moskovê veqetandibû di 11'ê çileyê de li Moskovê û li herêma pîşesazî ya navendî bi cih kir. Her wiha wezaretê diyar kir ku dê Hêza Hewayî ya Rûsyayê îsal dê bibe xwediyê 4 pergalên parastina moşekên Triumf a S-400. ***MOSKOV***

## Kujerê Charlestonê tê darvekirin

- **Li kujerê nijadperest Dylann Roof ê ku di 2015'an de li bajarê Charlestonê yê Amerîkayê 9 reşik di dêrekê de kuştin, cezayê darvekirinê hat birîn. Doz li dadgeha federal hat dîtin û hikum hat dayîn ku kujerê nijadperest bi derziya bijehr bê darvekirin. Di dîroka Amerîkayê de cara yekemîn e ku dadgeha federal, kesekî ji ber sûcê nefretê bi darve dike. Kujer beriya komkujiyê gotinên nijadperest li dijî reşikan bi kar anîbûn. CHARLESTON**

## Li Afganistanê 50 kes hatin kuştin

- **Talîbanê piştî zêdebûna leşkerên NATO'yê êrîşên xwe yên li dijî Afganistanê zêde kirin. Piştî êrîşa li dijî parlamentoya Afganistanê, li bajarên Kandahar û Helmandê jî êrîşên bombeyî pêk hatin. Di encama van êrîşan de li Kandaharê 12 kes û li Helmandê jî 7 kesan jiyana xwe ji dest da. Li aliyê din hejmara mirovên di êrîşa li dijî parlamentoyê de jiyana xwe ji dest da, gihaşt 30 kesî. Talîbanê êrîş li xwe girtin. KABÎL**

## Çareserî nêz an dûr e!?

Girêk
**Reşo Wasif**

Amadekariyên civîna Astanayê berdewam in. Axaftinên aliyan nemaze jî daxuyaniya serokdewletê Sûriyeyê Beşar Esad a "Ez ji bo her tiştî amade me" îşaret pê dike ku Esad dê li gorî nexşeya Rûsya û Îranê tev bigere. Rûsyayê deklare kiribû ku dê Esad di hilbijartinan de nebe namzed. Li aliyê din Berdevkê Wezareta Karên Derve yê DYA'ê Mark Toner ji bo çareseriya polîtîk a li Sûriyeyê xwest ku PYD jî tev li civîna Astanayê bibe.

Helbet di civînên Cenevreyê de pozîsyona DYA'yê ya li dijî PYD'ê tê zanîn. DYA'yê ji ber ku partnerê xwe yê li herêmê - Tirkiye- nekarî îkna bike; PYD li derveyî civînan hat hiştin. Ji ber vê nêzîkatiyê ji civînan encamek derneket. Dîsa ya bû para civakên li Sûriyeyê êş û azar, koçberî û mirin bû.

Niha di nav vê geremola hanê de; divê baş were zanîn ku li Sûriyeyê DYA û Rûsya ew qasî ku pişta wan li hev bikeve, nêzî hev bûne. Her du hêzên hegemon jî dixwazin hesabên xwe yên polîtîk bi destekftiyên mezin û bi xisarên biçûk bigihînin serî. Me di nivîsa beriya vê de jî anî ziman; ev her du hêz di esasê xwe de ne xerîbê federalî, xweserî û pirrengiyê ne.

Melûm e; fişara aborî ya kûrewî serê wan jî tevlihev kiriye. Ji bo mezinbûnê pêdiviya wan bi enerjiyê heye. Navenda enerjiya erzan jî Rojhilata Navîn e. Enerjî, razemenî, mezinbûna aborî pêdiviyê bi aramiyê dibîne. Tam li vê derê hêzên mezin dikevin dewrê û pêşî tevliheviyê derdixin û piştre xwe wek rizgarker datînin holê. Sed mixabin ku ji ber yekitî û tifaqa gelan pêş neketiye ev hêzên mezin hê jî dikarin di bin navê demokrasî û azadiyan de mêtingeriyê bikin.

Kurd ji ber cerebeyên xwe yên dîrokî û bîrdoziya Tevgera Azadiyê zû bi lîstikê hesiyan. Ji ber vê yekê li ser 'rêya sêyemîn' gavine bihimmet avêtin. Bi rêya kantonan, li gorî taybetmendiyên herêmên xwe, xwe bi rêxistin kirin. Îro roj jî bi gaveke jê wêdetir bi 'Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê' bûne bêndera herî ewle ya herêmê. Zikêşiya hêzên hegemon jî ji ber vê ye. Nikarin kurdan bikişînin ser xeta xwe û ew terkî rehma dîktator û çeteyên herêmî kirin. Kurdan bi bedelên mezin rûşta xwe îsbat kir û danî holê ku ser dide lê îradeya xwe teslîm nake. Paşxaneya Cenevre û Astanayê ev rewş e.

Tirkiye û Îran ku ji ezelê ve dijminên hev in; manevrayên DYA û Rûsyayê dibînin û dizanin ku gavên ber bi kurdan ve, dê girêka netewedewletan veke. Çareseriyeke ku kurd tê de bin dê demokrasiyê bîne herêmê lê belê senaryoya din; ew ê trajediyan mezintir bike. Çawa ku piştî 1'emîn Şerê Cîhanê li Rojhilata Navîn bi 20'an dewletok hatin avakirin dê ev dewletok jî li hev parçe parçe bibin.

## Êrişên AKP'ê şermezar kirin

Êrişên dewleta tirk a dagirker li ser axa Rojava û avakirina dîwarê şermê didomin. Herî dawî dewleta tirk li hemberî bajarê Amûdê dest bi avakirina dîwar û kolandina xendekan kir. Koordînasyona Giştî ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Rojava têkildarî mijarê daxuyaniyeke nivîskî da û diyar kir ku Tirkiye bi vê rêbazê aloziya li Sûriyeyê kûrtir bike. QAMIŞLO



## Piştî du salan vegeriyan gundê xwe

Gundê Um El-Erbeîn ê 30 km dikeve başûrê rojavayê Serêkaniyê nîsana 2015`an di hemleya şehîd Rûbar Qamişlo de hatibû rizgarkirin. Lê ji ber çeteyên DAIŞ'ê hemû mal û zeviyên gund bi mayîn kiribûn şêniyên gund nikaribûn vegerin gundên xwe. Piştî salan gund ji mayînan hat paqijkirin û şêniyên gund vegeriyan gundên xwe. Her wiha gundiyan got ku ev bi şervanên YPG û YPJ'ê serbilind in. SERÊKANIYÊ



## Sersaxî ji malbata şehîd re hat xwestin

Bi dehan şêniyên bajarê Girê Spî û saziyan serdana konê sersaxiyê yê têkoşer Xalid Xelef El-Xemîsî ku li gundê wî Elî El-Bacîliyê yê başurê Girê Spî hatiye vedan, kir û sersaxî ji malbata wî re xwest. Di merasîma sersaxiyê de endamê têkiliyên TEV-DEM'ê Omer Elûş sersaxî ji malbata Xalîd re xwest û da zanîn ku dê herêm bi piştgiriya HSD'ê ji çeteyan bê paqijkirin. Her wiha li ser navê malbata şehîd jî Mehmûd El-Hendawî axivî û soza şopandina rêya şehîdan da. GIRÊ SPÎ



## Hezar û 500 mayîn hatin rakirin

Pêngava duyemîn a hemleya Xezeba Firatê ku di 10`ê kanûna 2016`an de ji du baskan ve hat destpêkirin bi hemû dijwariya xwe didome. Piştî rizgarkirina gundan, hêzên pispor ên girêdayî Xezeba Firatê yekser mayînên ku çeteyan li pey xwe hiştine rakirin da ku sivîl careke din vegerin gundên xwe. Ji roja destpêkê heta niha gelek mayîn hatin paqijkirin. REQQA

# Baskên Eyn Îsa û Kadiriyê gihaştin hev

Li gorî agahiyên ku ji herêma Reqqayê şervanên Hemleya Xezaba Firatê yên baskên Kadiriyê du gundên Kermancoyê rizgar kirin. Ji aliyekî din ve jî baskê Eyn Îsa piştî êrişên DAIŞ'ê yên gundê Cib Şeîr şikandine, bi sê baskan ve ketine nav tevgerê û gundê Hûvec rizgar kir. Her du bask li gundê Kermanco gihaştin hev û herêmeke berfireh dorpêç kir.

Pêngava duyemîn a Hemleya Xezaba Firatê di 10'ê kanûnê dest pê kir. Şervanan ji baskê Kadiriyê 57 km û li baskê Eyn Îsa jî 34 km bi pêş ketin. Di encama vê pêşketinê de, her du bask duh li gundê Kermancoyê gihaştin hev û herêm xistin bin dorpêçê.

Her wiha ji 31 ê kanûna 2016'an heta niha li gorî çavkaniyên HSD'ê, li baskê Eyn Îsa piştî rizgarkirina gundê Hûcev û Kermanco 45 gund û 20 gundik hatine rizgarkirin.

Bi rizgarkirina gundê Kermanco re, şervanên Xezaba Firatê 28 km nêzî Reqqayê bûn û rojavayê Reqqayê dorpêç kirin. REQQA - ANHA



# Li dijî aramiyê civîna çeteyan

**Di demên dawîn de dewleta tirk a dagirker hewl dide xwe wekî ku bi DAIŞ`ê re şer dike bide xuyakirin, lê belê efserên artêşa tirk çûn bajaroka Tebqayê û bi çeteyên DAIŞ`ê re civiyan. Hat zanîn ku dewleta tirk û çeteyên wê li dijî HSD'ê li herêmê civînan pêk tînin**

Dewleta tirk a dagirker di 24`ê tebaxa 2016`an de bi hinceta li dijî DAIŞ şer bike herêma Şahbayê dagir kir. Ev dagirkerî 5 meh e bê navber didome û bi dehan sivîl hatin kuştin û bi hezaran cih û warên gelên herêmê hatin rûxandin. Li gorî hin daneyan bi qasî 30 hezar kes ji ber dagirkeriya dewleta tirk neçarî koçberiyê bûye. Di demek ku lîstika DAIŞ û dewleta tirk a Şehbayê didome de efserên dewleta tirk û serçeteyên DAIŞ'ê li bajaroka Tebqaya Reqqayê civînek taybet bi êlên herêmê re li dar xist.

Çavkaniyên pêbawer ji Tebqayê ragihand ku dewleta tirk bi çeteyên DAIŞ`ê re li bajaroka Tebqayê civiyaye. Di civîna her du aliyan de ji bo HSD`ê bajaroka Tebqayê ji DAIŞ'ê rizgar neke, planek amade kiriye. Li gorî vê planê bi êlên herêmê re civîn dane destpêkirin.

Çavkaniyan diyar kir ku li gorî plana dewleta tirk û çeteyên DAIŞ'ê dê bi êlên Tebqayê re civînan li dar bixin û gelê herêmê li dijî HSD'ê sor bikin.

Heman çavkaniyan da zanîn ku efserên artêşa tirk bi gelek eşîrên Tebqayê re civîn li dar xistine û di civînê de efserên Tirkiyeyê ji eşîrên Tebqayê xwestiye ku daxuyaniyekê bidin û bêjin ew HSD'ê qebûl nakin.

Çavkaniyan destnîşan kir ku efserên artêşa tirk bi darê zorê rûspiyên eşîran beşdarî civînan dikin. Rûspiyên ku di civînê de amade bûne ji çavkaniyan re gotine ku kesên civîn çêdikirin efserên artêşa tirk in, lê xwe wekî çeteyên DAIŞ`ê didin xuyakirin.

Li gorî çavkaniyan di civînê de efserên artêşa tirk a dagirker ji rûspiyên herêmê re gotine ku di dawiya vî şerî de ger bi ser kevin dê herêmeke sunî werê avakirin û lê bi ser nekevin pêwîste gelê vê herêmê rê li pêşiya kurdan veneke û dijî wan bisekinin.

Ji aliyekî din ve jî hemwelatiyên bajaroka Tebqayê ragihand ku gelek çeteyên Mertala Firatê derbasî bajarokê bûne da ku nehêlin HSD bajarokê rizgar bike. Her wiha şêniyên bajaroka Tebqayê li benda HSD'ê ne da ku wan ji çeteyên DAIŞ û Mertala Firatê rizgar bikin. *ANHA*



# 'Tirkiye çareseriyê asteng dike'

CÎHAD ROJ / QAMIŞLO - ANHA

Muxalifê sûrî Riyad Derar der barê civîna Astanayê de ku di navbera Tirkiye, Rûsya û Îranê de pêk bê, axivî û civîn wek 'civîna berjewendiyan' bi nav kir û anî ziman ku heke kurd û HSD di wê civînê de ne amade bin dê encamên baş ji civînê dernekevin.



Derar destnîşan kir ku civîna Astanayê li ser daxwaza Rûsyayê piştî şerê Helebê ku hêzên çekdar bikişîne nav danûstandinan, pêk hatiye. Derar diyar kir ku her hêzeke Sûriyeyê ji bo cihê xwe di nav pêvajoyê de bigire dixwaze beşdarî civînê bibe û wiha got: "Di heman demê de her hêzeke siyasî koalîsyona xwe xurt dike da ku beşdarî Astanayê bibe. Lê di vir de aliyên ku wê beşdar bibin dê li ser daxwaza Rûsya, Tehran û Enqereyê pêk were."

Derar anî ziman ku Tirkiye hewl dide çekdarên îslamî beşdarî pêvajoya siyasî bike û ev tişt anî ziman: "Lê ev yek dê rastî helwesta Îran û hebûna bibandor a kurdan were. Ji ber vê yekê jî helwesta Tirkiyeyê çareseriyê asteng dike."

Derar da zanîn ku dê serkeftina Astanayê ne mayînde be û wiha domand: "Çareseriya civîna Astanayê herî baş beşdarbûna hemû aliyên têkildar e û divê tu aliyên siyasî ji civînê neyên dûrxistin." Derar diyar kir ku heke kurd û HSD beşdarî civîna Astanayê nebin dê tu wateya wê nemîne û bi ser nekeve jî.

## Çareseriya Sûriyeyê federasyon e

ERDOGAN ALTAN / KOBANÊ - DÎHABER

Xebatên ji bo Federasyona Sûriyeya Bakur, bi beşdarbûyîna hemû etnîsîte û baweriyên cuda didomin. Endamê komîtiya birêxistinbûnê ya Federasyona Sûriyeya Bakur a di navbera 16-17'ê Adara 2016'an de li bajaroka Rimêlana bajarê Qamişloyê hat îlankirin, Ferhat Dêrik destnîşan kir ku dê pêşnûme di krîza Sûriyeyê de bibe werçerx.

Dêrik got ku di nav pêşnûmayê de hemû cudahî cih digirin û diyar kir ku di nîqaşên dawîn de wan nav guherandiye û wiha axivî: "Divê neyê fikirîn ku dê navê 'Rojava' bimîne. Navê Sûriyeya Bakur, hem Rojava hem jî herêmên din di nav xwe de dihewîne. Li vê herêmê tenê kurd najîn. Ji ber vê me ev nav wek navekî guncaw dît." Dêrik anî ziman ku li dijî pergala ku ew dixwazin pêş bixin gelek êriş pêk hatiye û ev tişt anî ziman: "Bi van êrîşan xwestin me bikişînin ser xeta rejîmê û komên îslamî. Me bi xweseriya demokratîk dest bi pergala xwe kir. Niha jî em dixwazin bi federasyonê wê bi pêş bixin. Çareserkirina krîza Sûriyeyê bi federasyona demokratîk pêkan e."

Dêrik anî ziman ku sedema kûrbûna krîza Sûriyeyê rejîma Baasê ye û diyar kir ku divê hikumeta Şamê dev ji pergal û siyaseta xwe ya dîktaroriyê berde. Dêrik destnîşan kir ku pergala ku ew bi pêş dixin ne yek alî ye.

Dêrik da zanîn ku Pêşnûmeya Fedaralîzma Demokratîk a Sûriyeya Bakur her ku diçe bi pêş dikeve û wiha bi dawî kir: "Berê Rojava findek bû, niha bûye meşaleyek. Rojava pêşengiya vê dike. Em di nav hin sînorên diyarkirî de tev nagerin. Divê her kes vê wisa bizane û bibîne."

## Madeyên demborî hatin şewitandin

Komîteya Zimhêrê ya Şaredariya Gel a bajarê Til Hemîsê li bazaran geriya, madeyên demborî yên di dikanan de mane desteser kirin û bac ji dikandaran xwest. Piştre jî ev madeyên demborî hatin komkirin û şewitandin. TIL HEMÎS

## Şêniyên Holê komunên xwe ava dikin

Şêniyên bajaroka Holê ji bo birêxistinkirina jiyana xwe komun û komîteyên xwe ava dikin. Di vê çarçoveyê de TEV-DEM ê ji şêniyên taxa başûrê rojavayê bajaroka Holê re civînek li dar xist. Di civînê nûnerên TEV-DEM ê û bi dehan şêniyên taxê amade bûn. Di civînê de girîngiya komunê ji gel re hat vegotin. Her wiha di dawiya civînê de komuna taxê hat avakirin. HESEKE

## Ezmûnên dibistanên seretayî dest pê kirin

Bi hezaran şagirtên dibistana seretayî ji pêkhateya ereb û kurd ên herêma Efrînê û Şahbayê ji bo ezmûnan berê xwe da dibistanên xwe. Rêvebera Komîteya Meteryalan a girêdayî KPC`ê Jîn Bekir got ku hezar û 600 mamoste ji wan 9 dibistanên Şahbayê li ser 262 dibistanan ji bo rêvebirina ezmûnê hatine belavkirin. Her wiha ezmûn dê heta 19'ê mehê bidomin û piştî ezmûnan betlaneya 15 rojan dest pê bike. ANHA

ROJEVA Medya
12 Çile 2017 Pêncşem

# TL her roj bê qîmetir dibe

**Ji ber polîtîkayên hikumeta AKP'ê û Tayîp Erdogan krîza aborî mezin dibe û pereyên Tirkiyeyê li hemberî pereyên welatên din bê qîmet dibe. Her wiha bêkar zêde dibin û îthalat roj bi roj ji îxracatê zêdetir dibe**

Bi rageşiya siyasetê re krîza aborî û dolar jî zêde dibe. Her roj dolar li hemberî TL zêde dibe. Pereyê Tirkiyeyê li hemberî dolar bê qîmet dibe.

Bankaya Navendî xwest tedbîran bigire. Lê tedbîrên Bankaya Navendî bandora xwe nekir. Dolar, ji 3.89'an derbas bû û destpêka rojê bi 3.8960'an dest pê kir. Her wiha euro ji 4.11'an derbas bû û gihaşt 4.1128'an.

**ÎXRACAT Û ÎTHALAT**

Bilindbûna karên îthalatê yên ku wekî kona reş a Tirkiyeyê tê binavkirin her ku diçe bilind dibe. Li gorî daneyên Bankaya Navendî a Komara Tirkiyeyê (TCBM) karên vekirî yên îthalatê ji meha mijdara 2016'an li gorî sala berê dê 32 milyon dolar zêde bûye û bûye 2 milyar 268 milyon dolar. Karên îthalatê yên 12 mehan gihaşt 33 milyar 651 milyon dolarî.

Dihat hêvîkirin ku kar 2.75 milyon dolar be. Di meha pêşiya wê de dane wek 1.68 milyar dolar hatin aşkerakirin û 1.66 milyar dolar jî sererastî hatibû kirin. Şaşiya di meha Mijdarê de 2.73 milyar dolar bû.



**BÊKAR ZÊDE DIBIN**

Hîndekar û aborînas Doç.Dr. Metîn Altiok, diyar kir ku sedema bingehîn a krîza aborî kêmbûna rêjeya kara kapîtalîzmê ye. Altiok, diyar kir ku aboriya Tirkiyeyê girêdayî aboriya cîhanê ye. Altiok diyar kir ku di qadên îmalata pîşesazî, madenvanî, çandinî de hilberîn pêş nakeve û li şûna wê bêtir qada înşaatê bi pêş dikeve. Altiok da zanîn ku pêşketina aborî di demên dawîn de zêdetir li ser sektora înşaatê bi pêş dikeve û ev yek jî bêtir dewletê ji qada pîşesaziyê dûr dixe û hilberînê kêm dike." Altiok destnîşan kir ku li Tirkiyeyê li derveyî qeydan 666 hezar kedkarên betal û êdî heviya xwe ji kar qut kirine hene. *AMED*

## Li Cizîrê 28 kes hatin binçavkirin

**Li taxên Konak, Yafes, Nûr, Cûdî û Sûrê yên navçeya Cizîr a Şirnexê di serdegirtinên malan ên serê sibê de 28 welatî hatin binçavkirin. Hat îdiakirin ku gelek kesên hatine binçavkirin ji aliyê polîsan ve hatine derbkirin. Li gorî daxuyaniya Walîtiya Şirnexê welatiyên hatine binçavkirin bi hinceta, "têkiliya wan bi rêxistinê re heye" hatine binçavkirin û li Midûriyeta Polîsan a Cizîrê tên ragirtin. ŞIRNEX**



## Ji bo Berberoglu cezayê muebetê

**Danişîna doza Gerînendeyê Weşana Giştî ya rojnameya Cumhuriyetê yê berê Can Dundar, nûnerê rojnameye yê Enqereyê Erdem Gul û parlamenterê CHP'ê Enis Berberoglu li 14'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê hat dîtin. Dozger ji Parlamenterê CHP'ê Berberoglu cezayê muebetê û ji Erdem Gul û Can Dundar re her yek 10 sal ceza xwest. STENBOL**



## 60 karsaz hatin girtin

**Di çarçoveya operasyona li dijî çêkerên fînansa Cemaeta Gulen de 60 karsaz ên hat îdîakirin ku ji rêxistinê re alîkarî kom kirin û fînanse kirine, bi sûcdariya "endamên rêxistinê ne" hatin girtin. Her wiha 50 kes jî bi şertê kontrola edlî hatin berdan. Di nava kesên hatine girtin de kurê Serokê Lijneya Rêvebir ê Boydak Holdîngê yê berê Mustafa Boydak, Mahmut Samî Boydak û birayê wî Bekîr Boydak jî hene. STENBOL**



## Planên qirêjî yên qeyûm

Qeymeqam Hamdî Bilge yê wek qeyûm tayînî Şaredariya Akdenîzê hat kirin, karkeran ji kar derdixe. Roja hat tayînkirin, peymana 11 karkeran nû nekir û hat derpêşkirin ku, der barê 500 karkeran de vekolîn daye destpêkirin.

Tê diyarkirin ku li şûna kesên ji kar tên derxistin, kesên ji aliyê AKP'ya Mêrsînê û navçeyên wê tên diyarkirin, tên bicihkirin. Serokê Şaxa DÎSK'a Mêrsînê Kemal Goksoy diyar kir ku, ev gotegot mirovan nerihet dikin û got, ew ê mafê karkeran biparêzin. Dest nîşan kir ku, li desteya serokên Sendîkaya Karkerên Xizmetên Giştî (Genel-Îş) qeyûm wek îpotekkirina vîna gel hatiye nirxandin û wiha got: "Qeyûm, kelepçekirina vîna gel e."




Goksoy dest nîşan kir ku, bi tayînkirina qeyûm re serlêdanên kar zêde bûne û wiha domand: "Piştî qeyûm hat, her kes wî wek AKP dizane. Ji ber vê bi awayekî zêde AKP'yî serlêdanên kar dikin. Birêvebirina qeyûmê wek firsendê dibînin, hewldaneke ku dê karkeran ji kar derxînin û AKP'yiyan li şûna wan bi cih bikin heye." *MÊRSÎN*

## Lîstika neqlkirina dozan

Di çarçoveya lêpirsîna ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Colemêrgê ve tê meşandin de, der barê parlementerên HDP'Ê yên Colemêrgê Nîhat Akdogan, Selma Irmak û Abdullah Zeydan ên di 4-7'ê mijdara 2016'an de hatin girtin de doz hatibû vekirin û ev doz bi hinceta "ewlehiyê" ji Colemêrgê neqlî Amedê hatibûn kirin.

Her wiha dozên Hevseroka DBP'ê Sebahat Tuncel û Hevşaredara Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê yên girtî ku dê li Amedê bihatana dîtin jî, bi hinceta ewlehiyê tê xwestin ku neqlî bajarekî din bên kirin. Parlementerên HDP'ê Akdogan, Irmak û Zeydan ên ji ber dozên cuda girtî ne, îdianameyên wan ji aliyê 1'emîn û 2'yemîn dadgehên cezayên giran ên Colemêrgê ve hatibûn qebûlkirin û heman dadgehan bi hinceta Colemêrg ji aliyê ewlehiyê ve cihekî "hesas" e û anîna parlementeran dê "di warê ewlehiyê de bi rîsk be", ji bo neqilkirina dozan bi rêya Serdozgeriya Komarê ya Colemêrgê serî li Wezareta Dadê dabûn. Daîreya bi hinceta ewlehiyê biryara dê doz ji Colemêrgê neqlî Amedê bên kirin dabû. *AMED*

## Li tu derê ev qas astengî tune ne



Piştî, rojnameger Omer Çelik, Metîn Yoksu, Tunca Ogreten, Mahîr Kanaat, Derya Okatan û Eray Sargin ên bi hinceta nûçeyên têkildarî "RedHack"ê hatin binçavkirin û ev 19 roj e tên ragirtin, careke din azadiya civaka medyayî û çapemeniyê ket rojevê.

Prof. Dr. Yaman Akdeniz ê bi xebatên xwe yên mafên sîberê û huqûqa înternetê tê nasîn, kontrolkirina platformên medyaya civakê yên ku îcraatên îktîdarê li ser tên rexnekirin wiha nirxand: "Ne bawer im li welatekî din civaka medyayî evqas rastî çewisandin û pêkûtiyan tê." Akdenîz li hemberî astengiyan bêdengiya facebook û twîtterê rexne kir. *STENBOL*

## Dê têkoşînê bidomînin

Doza li dijî Seroka Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) Şebnem Korûr Fîncanci, Nûnerê Tirkiyeyê yê Rojnamevanên Sînornenas (RSF) û Raportorê Bîanetê Erol Onderoglû û rojnamevan-nivîskar Hamet Nesîn, ku ji ber piştgirî dan rojnameya Ozgur Gundemê li wan hat vekirin, bi rûniştina duyemîn dewam kir.

Rûniştina dozê li 13'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê pêk hat û Fîncanci û Onder tevî parêzeran tevlî bûn. Midûrê Karên Nivîsê yê Ozgur Gundemê Înan Kizilkaya jî neanîn rûniştina dozê. Piştî xwendina belgeyên ji dadgehê re hatin şandin, heyeta dadgehê bi hinceta ku ifadeya nivîskar Ahmet Nesîn nehatiye girtin, rûniştina dozê taloqî 21'ê Adarê kir.



Piştî rûniştinê, li ber li ber ediyeyê daxuyaniyek hat dayîn. Fîncanci li vir axivî û wiha got: "Gelek rojnamevan ji ber ku rastî ragihandine, îro tên darizandin. Cihê em lê ne cihekî rast e. Em ê têkoşîna xwe bidomînin." *STENBOL*

www.arsivakurdi.org

# Ji bo Ocalan grev û nobed




Çalakiya nobedê ku ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li bajarê Strasboûrg ê Fransayê dest pê kir, di hefteya 238'emîn de ye. Ji bo azadiya Ocalan li Helebê welatî ketin greva birçîbûnê.

Çalakî li pêş avahiya Konseya Ewropayê tê lidarxistin. Kurdistaniyên ji bajarê Gîessen ê Elmanyayê hatin, vê hefteyê bûn nobedar. Çalakgerên vê hefteyê Ekrem Hezexî, Osman Rojava, Emîn Resûl û Rojhat Zaxo ne. Çalakgeran dan xuyakirin, azadiya Ocalan û azadiya gelê Kurd yek e û gotin, ew ê xwedî li şehîdan û têkoşîna azadiyê derkevin. Çalakgeran diyar kirin, ew hêvîdar in di sala 2017'an de Ocalan û gelê kurd azad bibin û anîn ziman, kurdên li dora nêrînên Ocalan li hev civiyane, xwe li tevahiya cîhanê îspat kirine.

TEV-DEM'ê Ji bo şermezarkirina kiryarên ku dewleta Tirk li hember Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk tîne, bi beşdariya hemû pêkhateyên taxa Şêxmeqsûd çalakiya greva birçîbûnê organîze kir. Hevserokê Hevbeş ê taxa Şêxmeqsûd Mirî Şiblî ku beşdarî çalakiyê bûye anî ziman ku wan ji bo azadiya Ocalan e û wiha axivî: "Ez tecrîda li ser Ocalan bi tundî şermezar dikim. STRASBOÛRG - HELEB

# PDK zirarê dide yekitiyê

**PDK bi kirinên xwe zirarê dide yekitiya kurdan. Ji aliyê asayîşa PDK'ê ve wekîlên Tevgera Goran û Komala Îslamî hatin binçavkirin. Parlamenterên başûrî bang li gel kir ku li ber van kiryaran rabin**

Parlamenterê Tevgera Goran Alî Heme Salih û parlamenterê Komala Îslamî Soran Omer ji bo ku biçin Hewlêrê ji Silêmaniyê bi rê ketibûn, beriya bikevin Hewlêrê ji aliyê hêzên asayîşê yên Pirdê yên PDK'ê ve hatibûn binçavkirin. Di binê çavan de heqaret li parlamenteran hatibû kirin û li wan hatibû xistin. Her du wekîl nîvê şevê li Silêmaniyê hatibûn vegerandin.

Wekîlên Tevgera Goran û Komala Îslamî ji ANF'ê re axivîn û helwesta PDK'ê şermezar kir ku wekîlên partiyên wan binçav kirine.

Parlamenterê Tevgera Goran Bestûn Faîk nerazîbûneke tund nîşanî binçavkirinan da û wiha got: "Rewşeke gelekî ne baş e. Ev yek rastiya PDK'ê ye ku dibêje 'ji bo çareserkirina krîzê bi partiyan re hevdîtinan dikim' radixe pêş çavan. Eger rewşek hebe, ev bi qanûnan çareser dibe. Beriya niha nehiştibû Serokê Parlamentoyê Yusuf Muhammed bikeve Hewlêrê. Piştî vê bûyerê diviyabû tiştekî bi vî rengî nehata kirin. Jixwe wan bi xwe jî gotibû ku ew ê careke din tiştekî bi vî rengî nekin. Mixabin PDK karên gelekî ne baş dike. Lazim e her kes li ber vê yekê rabe."

Ji Komala Îslamî parlamenter Hewraman Heme Şerîf jî wiha axivî: "Em van binçavkirinan şermezar dikin. PDK qanûnan binpê dike. Ne tiştekî bê qebûlkirin e, ku heman tişt careke din dubare kir. Divê kes li pêşberî vê rewşê ne bê deng be."

Parlamenterê YNK'ê Salar



Mahmud nerazîbûn nîşanî binçavkirinan da û wiha got: "Rewşeke gelekî ne baş e. Binçavkirina bi vî rengî ne tiştekî qebûlkirinê ye. Parlamenter mirovên ji rêzê nîn in. Divê hurmet ji wan re bê nîşandan. PDK bi vê rêbazê nikare pirsgirêkan çareser bike." *HEWLÊR - ANF*

## 'Ne hedê dewleta tirk e'

Hevserokê Tevgera Azadî Mihemed Abdullah nerazîbûn nîşanî daxuyaniya hevpar a serokwezîrê tirk Yildirim û Serokê PDK'ê Mesut Barzanî da ku Yildirim ji PKK û PYD'ê re got 'terorîst'.

Mihemed Abdullah mijar ji ANF'ê re nirxand û wiha got: "Serokwezîrê tirk bi daxuyaniya xwe ya li Başûrê Kurdistanê re vê mesajê dide: Xwediyê vê derê em in. Em çi bixwazin, em ê wê bikin. Yên li vê derê jî karmendên me ne." Abdullah bêdengiya Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî li pêşberî gotina "PKK û PYD terorîst in" a Yildirim nirxand û got: "Mixabin ew bêdengî rewşeke xeternak bû. Şermezar dikim."

Abdullah da zanîn ku derxistina PKK'ê ji Şengalê ne hedê dewleta tirk e, ev meseleya navxweyî ya kurdan e. BRUKSEL - ANF

# Meclisa DBP'ê kom bû



Endamê Meclîsa DBP'ê di Serokatiya Hevserokê DBP'ê Kamuran Yuksek de li Amedê li hev kom bûn

Cigirên Hevserokên DBP'ê û Endamên Meclisa DBP'ê amade bûn. Civîna DBP'ê ku ji çapemeniyê re girtî pêk hat dê operasyonên siyasî yên li dijî endam û rêveberên wan, Yekitiya Neteweya Kurd, Niqaşên Qanûna Bingehîn, qeyûmên li dijî Şaredariyên DBP'ê bên hiqaşkirin. *AMED*

## Ji Rojava



Nalîn Dîcle

# Ax yekitî...

Bi qasî lehengiyê, dîroka kurdan bi xiyanet birakujiyê jî tijî ye. Mamoste Cegerxwîn bi gotina; "Eger em nebin yek, em ê herin yek bi yek" ev rastî îfade kiriye. Jixwe yekitî heyala her demê ye.

Lê mixabin di sala 21'emîn de hê jî ev xeyal nebûye rastî û hê jî tirsa şerê birakujiyê heye. Ji ber tovê xiyanetê yê ku dijminan li nav kurdan reşand, di vê serdemê de jî di rastiya binemala barzaniyan de şîn hatiye. Li salên 90'î binêrin ka barzaniyan çend caran bi tang û topên dagirkeran şerê birakujî kiriye.

Her çend di salên dawîn de gelek caran Barzanî gotibe ku dema birakujiyê çû, êdî dema yekitiyê ye û dilê kurdan wisa xweş kiribe jî, lê mixabin tu caran nekarî hevsarê xwe ji destê dagirkerên Kurdistanê, bi taybetî jî Tirkiyeyê rizgar bike. Lewre metirsiya şerê birakujiyê hê jî wek xetereyeke mezin li pêşiya kurdan e. Ma şerê birakujiyê li hemberî hev tenê bikarinîna çekan e? Dijminahiya partiyên kurdan, bi dagirkeran re li ser nirxên kurdan bazar kirin, birakujî nebe, çi ye? Tişta ku niha Barzanî dike ev bi xwe ye.

Jixwe heman bazar û lîstik di 8'ê çileyê de dubare bû. Gelo dijminahî û gefên ku Binalî Yildirim li gel Barzanî li kurdan dixwarin nîşaneyên çi ne? Jixwe axaftina Binalî Yıldırım ji serî heta binî dijminahiya kurdan bû. Binalî Yildirim li ser axa Kurdistanê, li ber ala hikumeta Herêma Kurdistanê, ji kurdan re got terorist û dagirker. Barzanî çi kir? Barzanî mîna rebenekî yan serî çemand, yan serî hejand. Ma ev cara yekê ye ku Barzanî serî li hemberî dargirkeran diçemîne? Ji bîr nekin, kurdên bişeref, dema diçin sêdarê jî û dema diçin zindanê jî her serê wan bilind e. Ji ber tiştekî ku jê şerm bikin nîn e.

Her çend Barzanî her bi wêjeya serxwebûnê dilê kurdan xweş dike, hevdîtina bi Binalî Yildirim re nîşan da ku rastî tam berevajî vê ye. Jixwe Binalî Yıdirim di daxuyaniya hevbeş a çapemeniyê de Barzanî rût û tazî kir.

***Di rewşa heyî de ev pirs tên aqilê mirov:***

Ma kesekî ku pişta xwe daye dagirkeran dikare azadiyê ji welatê xwe re bîne? Ma ji bo serxwebûnê pêwîstî bi aboriyeke serbixwe nîn e? Ma Barzanî ji bo ku bikare xwe têr bike her car 150 milyon dolar ji dewleta tirk a dagirker bigire dikare li gel tirkan behsa Kurdistaneke serbixwe bike? Ma yên ku nikarin karmendên xwe têr bikin, dikarin serxwebûna xwe îlan bikin?

Baş e, tişta navika Barzanî û dagirkerên tirk bi hev ve girê dide çi ye? Tenê em li rewşa aborî binêrin, em ê baştir rastiyê fehm bikin.

***Li gorî daneyên fermî têkiliyên Barzanî-Tirkiyeyê yên darayî wiha ye:***

✓ Bazirganiya di navbera PDK û Tirkiyeyê de zêdeyî 12 milyar dolar e.

✓ Hikumeta PDK'ê ji sedî 37'ê danûstandinên xwe yên bazirganiyê li gel Tirkiyeyê dike. Tirkiye jî ji sedî 5.9'ê berhemên xwe dişîne Iraq û başûrê Kurdistanê.

✓ Li Başûr bi fermî hezar û 351 şirketên tirkan hene.

✓ Yek ji giringtirîn têkiliyên PDK'ê û Tirkiyeyê bazirganiya pertrola qaçax e. PDK'ê der barê veguhestina petrolê de rêkeftineke 50 salî li gel Enqereyê îmze kiriye. Pertrola bi qaçaxî didin Tirkiyeyê di ser Pira Îbrahîm Xelîl re ne di nav de, li gorî daneyên fermî hikumeta PDK'ê rojane 550 hezar bermîl petrolê bi rêya bendera Ceyhanê dişîne bazara cîhanî.

✓ Tenê di dema krîza darayî ya Başûr de milyarek û 150 milyon dolar Tirkiyeyê da Barzanî.

Ev jî vê pirsê tîne bîra mirov; gelo dewleta tirk di berdêla çi de milyarek û 150 milyon dolar daye Barzanî?

Jixwe mirov li van daneyên fermî yên bazara aborî binêre dikare fehm bike ka binemala barzaniyan çi qas aborî, petrol û bazara Başûr xistiye bin destê dagirkeriya Tirkiyeyê.

Barzanî diyar e tenê zenginiyên aborî yên Başûr, bêrê û niha jî nirxên siyasî û neteweyî dixe bazarê. Jixwe rastiya daxuyaniya çapemeniyê ya hevbeş a Barzanî û Yildirim jî vê rastiyê pir zelal rave dike. Gelo ev hemû xiyanet nebe, çi ye?

# Yekitiya neteweyî ferz e

BÎLAL GULDEM - AMED - DÎHABER

Nivîskar û rewşenbîrên kurd destnîşan kir ku pêwîst e kurd li ser hişmendiyeke neteweyî kom bibin û kurd vê firsenda dîrokî ya yekitiya kurdan ji dest bernedin.

Nivîskar Îrfan Babaoglu, destnîşan kir ku kurd di dîrokê de yekem car firsendekê bi dest dixin û beriya her tiştî yekitiya kurdan ferz e. Babaoglu destnîşan kir ku Tirkiye naxwaze yekitiya kurdan pêk bê û dixwazin kurdan bînin hember hev û got ku pêwîst e kurd û bi taybetî jî başûrê Kurdistanê ji van polîtîkayên şênber a Tirkiyê haydar bin.

Nivîskar Rênas Jiyan jî bi lêv kir ku kurd beriya yekitiya xwe ava bikin di nav kurdan pêwîstî bi hişmendiyeke neteweyî heye û wiha got: "Avakirina hişmendiyeke neteweyî di heman demê de bi xwe re yekitiya kurdan jî dê pêk bîne. Ji ber ku hişmendiya dîrokî û ya neteweyî ya kurdan li pêş neketiye, yekitiya kurdan zehmetir dike. Kengê ew hişmendiya dîrokî, zanînî û ew kûrbûn pêk hat, wê çaxê wê ji ber xwe ve yekitiya kurdan pêk bê." Jiyan destnîşan kir ku ji faktorên derveyî û hûndirîn wêdetir faktora herî mezin a li pêşiya yekitiya kurdan feodalîtiye.

Nivîskar Azad Zal diyar kir kir ku niha dem dema yekitiya kurdan e û wiha got: "Divê kurd di mêjî de bibin yek û hemû partî û tevgerên kurdan ji hev re hûrmetê bikin. Lazim e ku hemû tevgerên kurd di kongreya neteweya kurd de bên cem hev û yekîtiya xwe ava bikin."

Zal çûyîna Serokwezîr Binalî Yildirim a başûrê Kurdistanê wek "fesadî" bi nav kir û got ku divê haya kurdan ji fesadiyê hebe.

# Xeyala hemû kurdan e

Siyasetmedarên kurd ên li Îzmîrê, bal kişand ser nîqaşên ji bo avakirina yekitiya kurdan û diyar kir ku divê di demeke kin de nîqaş bikevin pratîkê.

Hevserokê DBP'ê yê Îzmîrê Suleyman Gunduz wiha got: "AKP ji bo kurd nebin yek û neyên cem hev plan û projeyên amade kirine dixwaze bixe dewreyê. Banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ji bo yekitiyê girîng e." Hevserokê HDP'ê yê Îzmîrê Mahfuz Guler, bi lêv kir ku yeketiya neteweyî û kongreya neteweyî xeyala hemû kurdan e û wiha got: "Em dizanin ku bi parçe sekinîn li pêşiya daxwazên neteweyî astengiyek e. Ji bo dawî li vê yekê bê divê di demek kurt de li derdora kongreya neteweyî kom bibin û daxwaz bibin yek." Endamê PM'ê yê HDP'ê Erkan Karabay jî wiha axivî: "Divê kurdên li 4 parçeyan di bin banê kongreya neteweyî de kom bibin û li dijî hêzên emperyalîst di banê platformekê de bibin yek." *ÎZMÎR - DÎHABER*

www.arsivakurd.org


# Di peywenda avakirina civakî de LEHENG

LOKMAN TURGUT

Dema mirov behsa lehengan bike û vê yekê di peywenda wêjeyeke devkî ya mîna ya li Kurdistanê de bike, bivênevê ya pêşî tê bîra mirov cureyekî esasî yê wêjeyê ye ku ez ê niha li vir bi kurtî wek "epîk" bi nav bikim. Erê hûn ne şaş in, Şer û Aştiya Lev Tolstoy jî vegotineke epîk e. Di heman demê de Îliyada Homeros jî bi xwe wek cureyekî devkî tê dîtin. Meseleya bingehîn a vî cureyî ew e ku ew dikare behsa mîtolojiyê jî bike, behsa destanên lehengan jî bike, behsa bûyer û kesayetiyên bi rastî jî bike, lê dema vê dike şik û guman ji rastîbûna vegotinê nîn e.

Helbet dema mirov berê xwe bide danasîna vî cureyî, mirov dibîne ku elaqeya wî bi komên nasnameyî re heye; wek mînak ji bo neteweyan behsa serdemên lehengiyê tê kirin û berhemên epîk jî behsa bûyer û lehengên vê serdema neteweyan dikin. Bila ev çend gotinên me kirî bin û em li peywenda kurdî vegerin; li Kurdistanê li gelek deveran ev cure di nav wêjeya devkî de bi navên mîna destan, şer û efsane tê nasîn. Heçî şer in, mirov dikare wekî destanên bi rengê kulîsan avakirî yên gotin û stranê bi kurtî bi nav bike. Ew dikarin bûyerên dîrokî yên tên nasîn û ji bo civakê girîng, wek mijar hilbijêrin an jî mijara wan destanên mîtîk jî be. Lê mirov divê hay ji vê yekê hebe; rastiya dîrokî û rastiya mîtîk her du jî di warê vegotinê de xwedî heman nirx û qedrê rastiyê ne û mirov bi rengekî din vê binirxîne, dê bibe xwexapandineke besît.

*Berhemên devkîbûnê, pê re jî repertuwara wê mîna kewarekê ne ku di peywenda avakirina netewe de ew kesên bi erka avakirina netewe radibin, bi qasî ku ji wan re divê û bi kêrî wan tê ji xwe re jê mijaran dineqînin û derdixin pêş*



***Kewareke bikêr a ji bo avakirinê***

Heger serdemên lehengî yên her koma nasnameyî hene, ew serdemên kurdan jî hene; li vir girîng e mirov ji hev derxe ku ev serdem ne serdemên dîrokî ne, lê ew serdem in ku çi rastî û çi tesewirkirî ji bo nasnameya koma elaeqedar girîng in û ji bo xwepênasekirina endamên komê diyarker in. Min beriya niha ji bo vê yekê û têkiliya wê bi devkîbûnê re gotibû*, berhemên devkîbûnê, pê re jî repertuwara wê mîna kewarekê ne ku di peywenda avakirina netewe de ew kesên bi erka avakirina netewe radibin, bi qasî ku ji wan re divê û bi kêrî wan tê ji xwe re jê mijaran dineqînin û derdixin pêş. Di nava tevgera rizgariya Kurdistanê de Kawayê Hesinkar figurekî bi vî rengî yê mîtîk ê Newrozê ye ku êdî bi pîrozkirina Newrozê re û bi serhildana kurdan re bivênevê bûye xwedî girêdaneke girîng.

Ango ew serdemên ji bo cureyê "epîk" girîng, ne serdemên bi rastî heyî ne, lê tesewirkirî ne; dema ku ev serdem nêzîk bin û qehremanên serpêhatiyan jî wekî qehremanên heyî û bihurî jî bin, ev rastî naguhere; lewma divê em ji bîr nekin, bûyereke jibîrkirî wekî ku hîç neqewimî be; lehengên jibîrkirî wekîe ku qet çênebûyî bin.

Ji netewe û wê de, her koma civakî hewce ye ku bi lehengan û bi qewimînên lehengî hebûna xwe wek kom rewa bike û vê jî bi awayekî ji rêûresmê bi piranî bi rêya afirandina berhemên cureyên "epîk" dike. Di nava kurdan de gava em berê xwe didinê, em dibînin ku di kewara bîra wan a berhemên devkî de gelek qehremanî hene û gelek leheng jî hene ku mêranî, mêrxasî û çelengiya wan derdikeve pêş; ji bo vê ez bi tenê behsa navên mîna Siyabend û Xecê, Cembelî, Metran Îsa, Seîd Beg, Derwêşê Evdî, Medoka Melê, Fatima Salih Axa bikim, dê bibe nîşana repertuwareke fireh. Lê belê rengekî din ê lehnegan heye ku yek ji wan jî Memê Alan e. Di Memê Alan de lehengê serpêhatiyê ji xweşmêrî û mêrxasiyê bêhtir bi "xweşikiya" xwe leheng e. Ew bi êşa ku dikişîne û bi rika xwe ya ji bo armanca xwe leheng e.



***Şêwazeke ji rêûresmê û modern***

Bi çi terzî dibe bila bibe, leheng ji bo civakekê û ji bo rewakirina nasnameya wê civakê diyar e ku pêwîst e werin afirandin û ev afirandin ne bi tenê ji bo texeyula kesekî/ê ye, lê belê ji bo vegotinekê ye ku xwe bigihîne hema hema tevahiya guhên endamên gihîştî yên vê civakê. Heger endamên civakekê nekarin xwe wek endamên wê bibînin, rewabûna hebûna wê jî pê re namîne. Ji ber wê yekê jî di avakirina nasnameyên modern de jî afirandina lehengan karekî diyarker e; Kobanê bi tena serê xwe bêyî Arîn Mîrkan êdî ne Kobanê ye û Minbic jî dê bê Ebû Leyla êdî nebe Minbic. Ev vegotinên bûyerên lehengî û serpêhatiya lehengan çawa ku dikare behsa bûyerên dîrokî û mîtîk bike, tevî ku roja me ya îro ye û hîna Şoreşa Rojava bi rê ve diçe jî, dikarin behsa jidayikbûna Rojava jî bikin.

***Her civak li dor destanên xwe û lehengên xwe dicive***

Ez bawer dikim bi vê çêlkirina bi kurtî ya Rojava jî mirov çêtir di girîngiya lehengan û van berhemên epîk digihîje. Her civak li dor destanên xwe û lehengên xwe dicive û li dora wan pêk tê. Civakeke ku ev têkiliya wê bi rewabûna wê re qut bibe, civakeke qels e. Ji ber wê ye ku Fransa kevintirîn neteweya modern e, lê mîta xwe ya afirandinê dibe serdema Sezar ê hîna ne împeratorê Romayê: Versongetorîks ê galyayî karîbû hema hema tevahiya eşîrên galyayî li dijî Sezar bike yek. Tevî ku serhildana wî ya sala 52'yan beriya serdema me bi ser neket jî û di dawiyê de ew teslîmî Sezar bû jî, serpêhatiya wî yek ji serpêhatiyên avakirina neteweya fransî ye. Li vir ne şikestina wî, lê berxwedana wî derdikeve pêş; ne teslîmbûna wî lê helwdana wî ya ku pê jiyana jin û zarokan ewle dike, ne eskerî kêmbûna wî ya ji Romayê lê serketina wî ya di yekkirina eşîrên Galyayê de derdikeve pêş. Ango vegotin xwe dispêre wan bûyer û qismên bûyeran ku civak û rewabûna hebûna civakê pê xurt dibin.

***Vegotina nû ya destanên kurdî***

Di vê çarçoveyê de mirov dikare li vegotina nû ya destanên kurdî binihêre û ez dibêjim, divê em şaş û metel nemînin ku leheng û bûyerên lehengiyê li gorî pêdiviyên avakirina netewe yan jî hevgirtina netewe ji nû ve werin tesewirkirin û guherandin. Lê ev rastiya hebûna Seyidxanê Kerr û mêrxasiya wî di Komara Agirî de, serhildana Şêx Seîd li hemberî Komara Tirkiyeyê yan jî mêrxasiya Metran Îsa li dijî waliyê osmaniyan ê Wanê kêm nake, berevajî, vê rastiyê dide ber rohniyeke nû ya civakî. Ev roniya nû ya civakî jî tenê heke serketî be, wê siberojê behsa avakirina neteweyekê bi rengekî serkeftî bike. Bi vî awayî, bi ya min mirov dikare şer, destan û efsaneyên kurdî yên kevn û lehengiyên wan ên nû bixwîne û bi vê awirê ji nû ve bifikire ka Selahedînê Eyûbî li ku dera vî cureyî ye, ka Kawayê Hesinkar bi çiya xwe beşek ji civaka kurd û vegotina wê ye, ka Rostem qehremanekî mîtîk ê avakirina civakî ye yan na.

** Mündliche Literatur der Kurden in den Regionen Botan und Hekarî. Berlîn, 2011*

www.arsivakurdi.org

## Bi kadroya 110 kesî derdikevin ser dikê

**PRODUKSIYONA ANIMALS MUSICAL** a yekemîn a Tirkiyeyê, li gorî standartên navneteweyî ye û bi kadroya xwe ya 110 kesî, dê di navbera 22 û 29'ê çileyê de li UNIQ Hallê derkeve pêşberî temaşevanan. Lîstika ji 7 salî heta 70 salî xîtabî her kesî dike, dê cara yekemîn bi kadroya xwe ya mezin derkeve pêşberî temaşevanan. Lîstik dê bi piştgiriya Hunerên Dika Gateyê û bi hevkariya UNIQ Hallê, cara yekemîn perdeyên xwe veke. Di lîstikê de dê kuklayên sewalan ku hatine amadekirin, kostumên bi destan hatine çêkirin, koroya polîfonîkê ya bi 4 dengan, dîsa muzîka li gorî standartên navneteweyî jî di her alî de xwe nîşan bidin. **STENBOL**



# Piştî vegeriyan Arhaviyê xwe azad hîs dikin



Wekî gelek welatên cîhanê li Tirkiyeyê jî bajarên metropol yên wekî Stenbol, Enqere û Îzmîrê her ku diçe qerebalix dibin. Her roja ku bajar qelebalix dibin, mirov zêdetir ji hev dûr dibin û bajarên mezin mirovan tengezar dikin. Hunermenda wêne-vîdeoyê Gokçe Sumerkan û muzîkjen Mecît Çelîktaş jî piştî bi salan li Stenbolê man, dawiya dawî berê xwe da gundê xwe. Gokçe û Mecît li taxa Cumhuriyetê ya navçeya Arhavî ya Artvînê atolyeya hunerê ava kir û got piştî ji Stenbolê hatine gund, xwe azad hîs dikin.

Sumerkan diyar kir ku ji ber karê bavê wê, zarokatiya wê li zozanên Rojhilatê Behra Reş derbas bûye û beşa wêne-vîdeo ya Zanîngeha Yildiz Teknîkê ya Stenbolê qezenc kiriye û bi vî awayî Stenbol nas kiriye. Sumerkan çawa diçe, difikire bê ka dê çawa ji vê Stenbola betonî xwe rizgar bike. Sumerkan piştî mezûn dibe di projeyên wêne-vîdeoyê de dixebite, lê her dem bê kêf dibe. Zarokatiya Mecît jî wek ya Gokçeyê li gundên Trabzonê derbas dibe. Lê ji bo xebatê diçe Stenbolê û ji xwezayê dûr dimîne. Fêm dike ku nikare bêyî xwezayê bijî û biryarê dide ku jiyana xwe bi tevahî biguhere.

*Hunermenda wêne-vîdeoyê Gokçe Sumerkan û muzîkjen Mecît Çelîktaş Stenbolê wek 'çola mirovan' pênase dikin, piştî 15 salan vegeriyan navçeya Arhavî ya Artvînê û dibêjin*

***"Em li vir azad in."***








**DIMS Û IHLAMÛR**

Gokçe û Mecît salek berê diçin Komeleya Ekolojî, Çand û Hunerê ya Gola Arhavî. Niha li wir atolyeyeke biçûk vekiriye û wek fabrîkayê dixebite. Mecît dîwarên atolyeyê bi alavên wek saz, bilûr û hwd. xemilandine û Gokçe jî gustîl, zendik û lênûskan amade dike. Di demên xwe yên vala de hilberînê dikin. Li gund jî dims çêdikin û ihlamûrê berhev dikin. Sumerkan aşkera dike ku qezenckirina pereyan ew azad nekiriye.

Gokçe û Mecît bang li kesên dixwazin li gundan bijîn jî kir û ev tişt got: "Biryarê bidin û pêk bînin. Bi qasî hûn difikirin ne zehmet e. Me sînor rakirin. Ji bo me tu wateya sînoran tune ye." *ARTVÎN - ŞÛJIN*

## Jinên Qatên Bilind

Pirtûka nivîskarê kurd Helîm Yûsiv a bi navê 'Jinên Qatên Bilind' ji Weşanên Avestayê hatibû çapkirin. Di pêşgotina pirtûkê de tê gotin ku mêrê ku li qatekê bi cih dibe, jin li qata jê bilindtir bi cih dibe û gava ku dikeve qata dawîn, jin dikeve nav ewran. Mêr ji jinê dixwaze nemire. Bi hêrs lê dike qîrîn û wiha dibêje: "Tenê mirî ji te hez nakin! Mîna kalekî ku ji nişka ve kamyon li bin guhê wî bixe û libên tizbiya wî yeko yeko li ser rêyan belav bibin wisa... Salên temenê mêr jî di nav destên jinê de belawela dibin. Helîm Yûsiv, di çîrokên xwe de gotinan tazî dike." **AMED**




## Sînemaya cîhanê êdî bi kurdî ye




Malpera awirek.com a nû dest bi weşanê kiriye, bi qasî 8 hezar fîlm ji sînemahezên kurd re parve kir. Xebatkarên malperê Ferhat Baysal û Aydin Dîren aşkera kir ku ji bo ku zimanê sînemaya kurdî bi pêş bikeve, wan xebateke wiha daye destpêkirin û dixwazin bi vê rêyê, sînemaya cîhanê bi zimanê kurdî bigihînin gel.

Li gorî nûçeya rojnameya Ozgur Polîtîkayê, malpera awirek.com di 6'ê çileyê de dest bi weşanê kiriye. Malpera bi ruhekî kolektîf hatiye vekirin, gelek fîlmên klasîk û nû yên cîhanê bi jêrnivîsa kurdî dikare bên temaşekirin. Her wiha di nava fîlman de, fîlmên kurdî jî cih digirin.

Rêveberên malperê bi mîhrîcanan re jî ketine têkiliyê û fîlmên kurdî yên ku beşa wan a mîhrîcanê bi dawî bûne, di malperê de weşandine. Fîlmên nû yên ku tên pêşandan, bi giranî ji bakur, başûr û rojhilatê Kurdistanê ne.

Hêj 8 hezar fîlm bi tevahî jêrnivîsa wan nehatiye nivîsandin. Rêveberên malperê di vê alî de ji şopînerên xwe alîkariyê jî dixwazin. Dîsa di malperê de ji bo kesên ku bi kurdî xwendin û nivîsandina wan tune jî xebata dublajê dane destpêkirin. Baysal û Dîren piştrast kir ku ji bo ku zimanê sînemaya kurdî bi pêş bikeve wan xebateke wiha daye destpêkirin.

Baysal destnîşan kir ku malper ji sedî sed bi kurdî ye û ev tişt got: "Piştî daxwazên zêde me xebateke wiha da destpêkirin. Armanca me ew e em sînemaya cîhanê bi zimanê kurdî ragihînin gel." Baysal got ku hêj hemû fîlm bi zimanê kurdî jêrnivîsa wan nehatiye nivîsîn, ji bo vê kampanyayek daye destpêkirin. Baysal piştrast kir ku li gel pêşxistina zimanê kurdî, dê zimanê sînemaya kurdî jî bi pêş bikeve.

Aydin Dîren jî destnîşan kir ku gelek fîlmên ku li gel tu kesî tune ne, di arşîva wan de cih digirin û ev bang kir: "Em bangî hemû hunermend, kesên senaryoyan dinivîsin, derhêner û bi taybetî derhênerên kurd dikin. Dikarin bi fîlmên xwe piştgiriyê bidin malperê. Bi vê re dê malper roj bi roj mezintir bibe." Dîren aşkera kir ku dê di malperê de beşa dublajê jî cih bigire. *AMED*

# NIRXÊN GEL ji holê radikin

Nivîskar-sînemager Îlham Bakir diyar kir ku karê yekemîn ê qeyûmên tayînî şaredariyên DBP'ê hatine kirin, girtina qadên çand, huner, ziman, jinan e û wiha got: "Polîtîkaya girtina sazî û jikarderxistina hunermendan tê meşandin. Armanca qeyûman jiholêrakirina hunerê ye."


Bi fermana Wezîrê Karên Hundir Suleyman Soylu ji 11'ê îlona 2016'an ve qeyûm tayînî 56 şaredariyên DBP'ê hatin kirin. Qeyûmên li şaredariyên DBP'ê dest bi kar dikin kar û barên çand, huner, jin û ziman asteng dikin, saziyan digirin û karkeran ji kar derdixin.

Li Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê 31 hunermendên di Şanoya Bajar de dixebitin ji kar hatin derxistin, li şaredariya Êlihê Midûryeta Şanoya Bajar ku ev 3 sal bûn dixebitî, bêyî hincetek bê nîşandan hat feshkirin, dawî li gelek xebatên hunerî hat anîn, tabeleya kurdî hat rakirin, xirakirina abîdeya Roboskê, rakirina peykerê şêrê serî wî mirov ku li ber Şaredariya Amedê bû û xebatên ziman dan rawestandin.

Nivîskar-sînemager Îlhan Bakir bertek nîşanî qeyûmên van pêkanînên faşîzan da û piştrast kir ku dixwazin bîra çand û hunerê ya kurdan tune bikin.

Bakir da zanîn ku dema qeyûm tayînî şaredariyan hat kirin du tişt kirin armanca xwe û wiha got: "Ya yekemîn çavkaniyên şaredariyê pêşkêşî xizmên xwe kirin û zêdekirina sermayeyê bû, ya duyemîn jî dixwazin hemû xebatên bo çanda kurdî rawestînin û ji holê rakin. Ger bê dîqatkirin dema qeyûm hatin şaredariyan xebatên bingehîn ên wekî komkirina çopê nesekinandin. Lê çi qas xebatên ji bo çand û hunerê hene hemû dan sekinandin. Sînemager, şanoger, xebatên ziman û xebatên muzîkê bi sedan astengiyan re rû bi rû man û ji kar hatine derxistin."

Bakir aşkera kir ku bi rakirina abîdeya Roboskê, dixwazin komkujiyê bidin jibîrkirin û wiha pê de çû: "Niha polîtîkayeke zirav a zextan heye. Armanca bingehîn a vê pêvajoyê ew e ku dixwazin bi şêweyê şerê zirav, xebatên di qada çand, ziman, huner, jin û zarokan de ji holê rakin." *AMED*



## Bi 'lekan'an li ser berfê bimeşe



Bajarên serhedê yên wek Wan, Agirî, Qers, Mûş û hwd. zivistanê berfa xwe zêde ye. Ev herêm bi mehan di binê berfê de dimîne. Ji ber berfa zêde gelek welatî di çûyîn û hatina derve de gelek zehmetiyan dikişînin. Ji bo wê li herêma serhedê çandeke wek 'lekan' derketiye holê. Lekan bi darekî xurt tê çêkirin û rêsên ku li naveroka darê tên rêsîn, cihên piyan tê çêkirin û bi piyan ve tên girêdan. Piştî ev hat amadekirin, êdî kesên bixwazin, dikare bi rihetî li ser berfê bimeşin. Bi vê rêyê çûyîn û hatina derve rihettir dibe û mirov çi qas giran be jî mirov bi befrê de naçe xwarê û bi rihetî li ser berfê dimeşe. **WAN**

www.arsivakurdi.org

# Îraq û Başûrê Kurdistanî de faalîyetê MÎTî

**MÎTê Tirkîya Başûrê Kurdistanî de çarçeweya Cepheyê Tirkmenî de bi nameyê Teşkîlatê Îstîxbaratî yê Tirkmenelî (TÎT) de teşkîlatêk îstîxbaratî awan kerdo û Başûr de vera PKK û şarê kurdî de tirkmenan rêxistine keno**

MERKEZÊ XEBERAN




Roje çin a ke têkilîya hukmatê AKP û Serekkomar Erdoganî bi rêxistinanê cîya-cîyayan reyde nêvejîyo orte. Yeno zanayîş ke Vakurê Kurdistanî de verê cû bi desan reyde têkilîya hukmatê AKP û rêxistinanê çeteyan vejîyaybî orte. Hukmatê AKP û Qesra Beştepe bitaybetî vera şarê kurdî û heme muxalîfanê bînan de nê rêxitinanê çeteyan dana xebetnayîş.

Bitaybetî rêxistinê çeteyan ra yê ke nameyê înan hîna zafêr vejîya aver nê bîy; Tîmê Esadullahî, DAIŞ, El Nusra, SADAT, Tugayê Heyfgirewtişî Tirkîya (TÎT), Ocaxê Alperenan, Ocaxê Osmanîyan û sewbîna. Nê rêxistinê çeteyan hîna zaf Rojawan û Vakurê Kurdistanî de ameyî xebetnayîş. Nika vejîya orte ke hukmatê AKPyî dest eşto, Başûrê Kurdistanî û ewja de zî wazeno zîhnîyetê xo rêxistine bikero.

**BI NAMEYÊ DÎPLOMASÎ**

Keyepelê lekolîn.orgî de goreyê xebera Goran Akreyîyî rejîmê Erdogan û AKPyî Başûrê Kurdistan û Îraq de ser Cepheyê Tirkmenî ra faalîyetanê xo zêde kerdo. Endamê Teşkîlatê Îstîxbaratî yê Milî (MÎT) wexto ke seba pêvînayîşê fermî Îraq ziyaret kenî, bin nameyê nasnameyê dîplomatîkan de Vera PKK û şarê kurdî de faalîyetanê îstîxbaratî kenî.

Vejîya orte ke MÎTê Tirkîya Başûrê Kurdistanî de çarçeweya Cepheyê Tirkmenî de bi nameyê Teşkîlatê Îstîxbaratî yê Tirkmenelî (TÎT) awan kerdo. MÎTî logoya teşkîlatê TÎTî daxî bi xo amade kerdo. No teşkîlat hîna zaf herêmanê Kerkûk, Duzxumatu, Kelar, Kifrî, Mexmur û Şengal de faalîyetê îstîxbaratî meşneno. Xora ameyêne zanayîş ke ciwanê ke çeteyanê DAIŞî ra remaybî, hetê komeleyê ke giredayeyê tirkmenan î ra perwerdeyê sîlehî dîyayêne înan.

**NAKOKÎYA MÎYANÊN**

26ê teşrîna verêne 2016 de vernîya Walîtîya Kerkûkî de Subayê Îstîxbaratî yê Tirkmenî Abdulemîr Cuma hetê kesê ke nasnameyê înan dîyar nîyo ra raştê suîkastî amebî. Abdulemîr Cuma bi hawayo giran neqlê nêweşxaneyî bîbî. Yeno vatiş ke no suîkast nakokîya mîyanên yê Cepheyê Tirkmenî ver bîyo.

Yeno zanayîş ke tirkmenî û Cepheyê Tirkmenî ke Îraq û Başûrê Kurdistanî de yî verê cû kontrolê cematî de bî. Lejo ke mabênê cemat û AKPyî de ameyo cuyayîş, yeno vatiş ke nika no lej mabênê tirkmenê ke tîya de yî yeno cuyayîş. Tîya de yew grûbe kontrole MÎTî de ya. Grûba bîne zî hema zî kontrolê cematî de ya. Serekê Pêroyî yê Cepheyê Tirkmenî Erşad Salih zî kontrolê MÎTî de bî.

**ENERJÎ DE PÊKERDÎ**

Goreyê çimeyanê herême, pêvînayîşo ke mabênê Serekwezîrê dewleta tirk Bînalî Yildirim û Serekwezîrê Îraqî Ebadîyî de virazya, teberê pêameyîşê ekonomîk û enerjî de sewbîna pêameyîşî nêameyî viraştiş.

**QEBUL NÊKERDO**

Reyna goreyê zanayîşê ke çimeyanê herême dayî, heyeto ke bi serekîya Serekwezîrê tirk Yildirimî de şîbî Îraq, Serekwezîrê Îraqî ra wazenî ke mektebê cematî bêrî padayîş. Labelê Ebadîyî vato 'nê mekteban de welatîyê ma wanenî û vera ma de ti falîyetê înan çin o' û waştişê înan qebul nêkerdo. Reyna goreyê çimeyan Ebadîyî operasyonê teberê sînorî û babeta Şengal de zî waştişê heyetê tirkî qebul nêkerdo û do îmze nêerzo pêameyîşan.

# Averşîyayîşê ziwanî û organîzasyonkarî

ESAT ŞANLI

Her ziwan wayîrê ercêkê komelkîyî yo. Zereyê sînoranê welatêk de mintiqe, kar, bawerî, mewqî û sinife ra gore qiseykerdişê ziwanêk vurêno. Ziwano standard formo hempar yê ziwanêk o ke ê qiseykerdoxê ziwanî pê yewbînan fam kenê.

Kurdî hetêk ra xo mîyan de bi dîyalekt û formanê cîyayan qisey kenê, la hetêna ra ziwanê kurdan hetê serdestanê zordaran ra bi desan serran ameyê qedexekerdişî (yasaxkerdişî). No qedexe bîyo sebeb ke ziwanê kurdkîyî nêeşkê aver şirê û asîmîlasyonî dir rî bi rî mendê. Nê formanê kurdkî ra vakûrê (zimeyê) welatê ma de ya ke polîtîkayanê asîmîlasyonkaran ra tewr zaf mutesîr bîya Kirmanckî (Zazakî) ya. Heta nika bi desan reyan sebebê peydemendişê ney formê kurdkî ser o nuşteyî nusîyayê, programanê televîzyonan de fikrî ameyê eşkerakerdişî. Fikro hempar no yo ke hetê nufûse ra taybîyayîşê na grûba kurdan û erey nusîyayîşê ci sebebê muhîmî bê zî sebebo bingehên polîtîkaya dewleta tirkan a ferzkerdişê tirkî yo. Polîtîkaya ferzkerdişê yew-ziwanî ya. Kurdê zazayî na yewe ra sey sebebo bingehên yê avernêşîyayîşê ziwanê xo dewleta tirkan bivînê se ra se heqdar ê.

Ma nika bîyerê kemasîyanê xo ser. Raşt o, dewleta Tirkîya semedo ke ziwanê kurdkî, bi heme formanê xo wa, raşte ra wedarîyo û heme kurdî bi tirkî qisey bikerê çi destê ci ra ame texsîr nêkerd û ewro zî texsîr nêkena. Labelê ma kurdî hemverê ney de se kenê? Ma çende wayîr ro formanê ziwanê xo vecênê? Zazayêk çende rîyê tesîrê wêrankar yê asîmîlasyonî ra zazakî û kurmanckî xo rê keno derd? Yan zî kurmancêk çende xo rê kurmanckî û zazakî keno derd?

Seke ma heme zanê ke dewrê ma dewrê organîzebîyayîşî yo. Komelê ke organîze nêbenê hetê nasname, kultur û ziwanî ra benê vinî, mîyanê nasname, kultur û ziwanê ke organîze bîyê, mîyanê înan de vilêşênê. Organîzasyon termêko komelkî yo, şexsî nêyo. Na yewe ra ney dewrê organîzasyonan de xebat û karê şexsîyî hemverê asîmîlasyonê sîstematîkî de nêeşkenê xo ver bidê, hetê tesîrî ra xeylî bisînor manenê. Kurdî ganî meselaya ziwanî ser o sey organîzasyonan vinderê, xusûsen kurdê vakûrî. Çunke asîmîlasyono tewr sîstematîk kurdanê vakûrî ser o ame bicaardişî û hema zî dewam keno.

Eke ma ewro qalê sîyasetê kurdî kenê, eke kurdbîyayîş biraştî ma rê muhîm o, ganî cayê ziwanî ney sîyasetî mîyan de sey pêşnîyazanê konferansanê ziwanan yan zî kampanyayanê serrewextan nêbo; sey polîtîkayêka stratejîke ke bieşko hemverê asîmîlasyonî de ziwanê kurdî bipawo cayê xo bigîro. Heta organîzasyonê ke xo sey organîzasyonanê kurdan name kenê û wayîrê hêzêkê pîlî yê na meselaya ziwanî ser o bi hawayêko stratejîk nêvinderê formê kurdkî yê ke vakûr de yê, xusûsen zazakî, nizd ra asîmîleyê tirkî benê û benê vinî.

Vinîbîyayîşê her formêk kurdkî ca verdê, vinîbîyayîşê her çekuyêka kurdkî yeno manaya biserkewtişê polîtîkaya asîmîlasyonkare. Ma tu formêk kurdkî nêeşkenê teslîmê destanê sîstemê asîmîlasyonkarî bikerê. Eke organîzekerdoxê ma, sîyasetkarê ma bi ziwanê şarê xo qisey bikerê, bêguman, şarê ma zî ko wayîr ro ziwanê xo vecîyo û qisey bikero. Eke organîzekerdox û sîyasetkarê ma xebatanê xo de, programanê televîzyon û radyoyan de herinda formêk kurdkî de bi ziwanêkê bînî qisey bikerê, şarê ma zî ko hîna leze asîmîle bibo û ziwanê ma rewtir bibo vinî.






www.arsivakurd.org

# Wendişê aye çin o, labelê medyaya komelkî ver tewqîf bîye

12ê kanûne 2016 de Riha de polîsan eştbî xeylê adresan ser û 200î ra zêde merdimî tepiştbî. Nê kesê ke ameybî tepiştişî ra yewe zî cinîya bi nameyê Fehîme Turane ke 60 serreyî ya. Fehîme badê ke 23 rojî tepişte mend, hetê mehkeme ra ameybî tewqîfkerdiş. Ame musayîş ke wendiş û nuştişê Fehîme çin o û her çiqas ke Fehîme medyaya komelkî nêxebetnena zî bi îdîaya medyaya komelkî ser ro çîyan pare kerda û seba ke endamê Kongreya Komelê Demokratîke (KCD) ya, ameya tewqîfkerdiş.
Babete ser o mêrdeyê Fehîme Abdulkadîr Turanî qisey kerd. Turanî va 'cinîya mi çi wendiş û nuştiş û çi zî tirkî zana' û qiseykerdişê xo wina domna: "Labelê yeno vatiş ke hesabê aye ya medyaya komelkî esto. Cinîya mi nêzana ke medyaya komelkî çî yo. Reyna yeno vatiş ke cinîya mi endama KCD ya, labelê cinîya mi 6 serrî verê endama partîya BDPyî bîye. Tîya ra zî yeno famkerdiş ke ti bingeyê nê îdîayan çin o."

**DOZGERÊKO NEWE AMEYO**

Turanî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant roja eştişê polîsan yê keyeyê înan ser de û wina va: "Wexto ke polîsî eştî keyeyê ma ser û keyeyê ma sehnayî, çîyêk nêdîyî. Sehnayîşî ra dima vatî ke 'ma do Fehîme bitepişî'. Wexto ke mi sebebê ci pers kerd, polîsan va ke 'yew dozgero newe ameyo û dosyayanê kehenan ser de cigêrayîşan keno; cok ra ma Fehîme tepişenî.' Labelê ti dosyaya cinîya mi ya kehen çinêbî. Nêweşîyê cinîya mi zaf î û cinîya mi bi no hawa 23 rojan tepişte mend. Ganî bi hawayo leze na neheqî wedarîyo." RIHA - ŞÛJIN



## Keyeyê mi ra 5 kesî çimanê mi ver de kişîyayî



Serrê 1993 û 94 de dewa Dumanli ya Dêrikî de qirkerdişêk virazîyabî. Qirkerdişî de dewijê bi nameyê Seydo Çevîren, Yusuf Çevîren, Abîde Çevîrene, Ahmet Çevîren, Ramazan Çevîren, Mehmet Nejat Aris, Pîro Ay, Vejdîn Avcil, Mehmet Erek, Ramazan Erek, Ahmet Erek, Mustafa Aydin û Mehmet Faysal Otunî bi îdîayê endamê PKK yî, ameybî qetilkerdiş. Mêrdîn de derheqê Fermandarê Cendirmeyan yê o wextî Musa Çîtîlî de mehkeme abîbî û bi qerarê Wezîrê Edaletî mehkeme kirişîyaye Çorum. Heyetê mehkeme serra 2014 de Musa Çîtîlî bêsuc dî û qerarê beratî da. Musa Çîtîl qerarî ra dima serra 2015 de agêra gureyê xo ser.
Babete ser o dewij û şahidê qirkerdişî Cahîde Çevîrene qisey kerde.

**KEYEYÊ MA MA SER DE RIJNAYÎ**

Cahîdeye qiseykedişê xo de bale ante qirkerdişî ser û wina va: "Tena yew lajê mi mende, o zî 43 rojî îşkence vîna. Hêzê tarî çimanê mi ver de keyna, 3 lajî û mêrdeyê mi kiştî. Qirkerdişî ver ne ganî, ne keye û ne zî heywanê ma mendî. Qatilî, lajê mi Ramazan, mêrdeyê mi Seydo û keynaya mi antî zereyê keye û dima ra keye înan ser de rijnayî. Keyeyê mi ra 5 kesan kiştî û ma yew de zî çek çinêbî."

**HETA KE EZ BIBA DO TÊKOŞÎN BIDA**

Cahîdeye qiseykedişê xo de va 'ez heta ke riyê dinya de weş biba, aye şewe vîra mi ra nêşona' û wina qedênaye: "Ma vera hêriş û zextan de bi mecburî koç kerdî. Mi seba domanê xo her tewir gure kerd. Mi hetêk ra têkoşînê cuye da, hetêk ra zî mi fek doza xo ra veranêda. Mi derheqê qatilan de mehkeme akerd. Seba ke mehkeme netîce bibo, 6 reyan ez şîya îfade. La veng vejîya û qatilî bêsuc ameyî dîyayîş. Avûkatê mi doze kirişt AÎHM. " MÊRDÎN - ŞÛJIN

# Sîlîvrî de polîtîkayê Îmrali estî

**Hemserekê TUADî Arîf Yilmazo ke Hepisxaneyê Sîlîvrî ra tehlîye bîbî, derheqê zext û tedayê hepsî de qisey kerd û wina va: "Bitaybetî Hûmara 9î ya Sîlîvrî de polîtîkayê Îmrali erzîyayî dewre"**

Teşrîna peyêne ya 2016 de bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî de Komeleya Piştîdayîşê Keyeyanê Hepsîyan (TUAD) amebî padayîş û hemserekê komele Arîf Yilmaz zî hetê mehkeme ra bi îdîaya 'propagandaya rêxistine kerdene' ra amebî tewqîfkerdiş û erşawîyabî Hepisxaneyê Hûmara 5î ya Sîlîvrî. Yilmazo ke verê cû doza KCKyî ra 3 serran hepis de mendbî, na rey zî 1 aşme hepis de mend û dima ra ame tehlîyekerdiş.

Arîf Yilmazî derheqê neheqîyê ke hepisxaneyî de ameyî/yenî kerdiş de qisey kerd.

Yilmazî va 'neheqîyê ke hepisxaneyan de benî badê ke 'prosesê çareserî' qedîya, zêde bîyî' û qiseykerdişê xo wina domna: "Her tewir tedayî erzîyayî dewre; mesela wextê surgunkerdişî de neheqîyê girdî ameyî cuyayîş û hîna zî yenî cuyayîş. Hepsîyî wexto ke yew hepisxaneyî ra surgunê hepisxaneyêko bîn benî, bi hawayo rut yenî sehnayîş û yenî derbkerdiş. No bêîstisna heme hepisxaneyan de esto."






**DERB Û ÎŞKENCEYÎ**

Yilmazî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant zêdebîyayîşê surgunan û qiseykerdişê xo wina domna: "Demo peynî de hepsîyêk mîyanê 5-6 aşman de çend reyan yeno surgunkerdiş. Bi seyan hetta bi hezaran hepsîyê ke 2-3 reyan ameyî surgunkerdiş, estî. Dewlete nêzana ke hepsîyanê sîyasîyan bierzo kura. Wextê surgunan de bi hawayo cîddî derb û işkence esto. Verê cû pêvînayîşo akerdeyo ke aşme de reyêk ameyêne viraştiş, nika 2 aşmî de reyêk yeno viraştiş. Telefon 2 hewteyî de reyêk yeno kerdiş. Verê hepisxaneyan de waro ortax estbî, la nika zaf hepisxaneyan de no heq nêdîyeno hepsîyan. Pêvînayîşan ra bigire, heta destronayîşê mektuban, xeylê neheqîyî yenî cuyayîş."

**POLÎTÎKAYÊ ÎMRALI**

Yilmaz peynîya qiseykerdişê xo de va 'Hûmara 9î ya Sîlîvrî de polîtîkayêko taybet dewre de yo' û qiseykerdişê xo wina qedêna: "Hepisxane goreyê tîpa Fyî ameyo viraştiş û hucreyê 2 kesî û 3 kesî estî. Saetê pêvînayîşê hepsî û avûkatan yeno astengkerdiş. Hepisxaneyê bînan de pêvînayîşê avûkatî heta saet 24:00 domîyeno, la Hûmara 9î ya Sîlîvrî de wina nîyo. Ewja de senî ke roje û saetê pêvînayîşê keyeyan estî, roje û saetê pêvînayîşê avûkatan zî esto. No zî sey polîtîkaya taybetin ke Îmrali de yena meşnayîş o."

Yilmazî tewr peynî bale ant Hûmar 5î ya Sîlîvrî ke o bi xo tede mendbî û va 'ewja de zaf hûmarî de hepsîyê nêweşî estî û tedawîya nê hepsîyan nîno kerdiş.' *STENBOL - DÎHABER*

# Na travma ya Helebçe ra kêmî nîya

OZGUR AYDIN / ÊLIH – ANF

Mabênê serranê 2002 û 2014 de, wextê hukmatê AKPyî de raporê ke hetê ÎHD, TÎHV û Sazîya Ewleyîya Sosyal û Xebatan ra ameybî amadekerdiş, hûmara kesê ke cînayetê ke kerdoxê înan nêdîyar, tepiştiş, hepisxaneyan de û cayê karî de merdî 17 hezar û 153 kesî bîye.

Cînayetê kerdoxê înan nêdîyar ke serranê 90î de bi hawayo yew bi yew bîyêne, wextê AKPyî de bi hawayo komkî benî. Mîyanê hûmara cînayetê ke kerdoxê înan dîyar nîyo de 700 cînayetê Êlih de bîyî, paweyê roşnkerdişî yî. Babete ser o Serekê Komeleya Heqê Merdiman yê Şûbeya Êlihî Mehmet Bagatirî qisey kerd.



**QETLÎYAMÎ BENÎ**

Bagatirî va 'serranê 90î de merdimî yew bi yew keye û cayê karî ra ameyênê remnayîş û ameyênê qetilkerdiş, labelê serra 2014 ra dima merdimî bi hawayo komkî yenî qetilkerdiş. Mesela yew hewte verê qezaya Ortakoyî de qirkerdişêk ame viraştiş û qatil hîna zî nêameyo dîyayîş. Reyna qatilê qirkerdişê ke Pirsûs, Amed û Anqara de virazîyaybî, hîna zî nêameyî dîyayîş. Nê heme sucê merdimîye yî."




**ÊDÎ AŞKERE BENÎ**

Bagatirî dewamê qiseykerdişê xo de va 'cînayetê ke kerdoxê înan nêdîyar î, bi qetilbîyayîşê Vedat Aydinî dest pêkerdbî' û qiseykerdişê xo wina qedêna: "Êlih de cînayetê ke kerdoxê înan nêdîyar î zî bi qetilbîyayîşê Siddik Tanî dest pêkerdbî û heta serra 2000î dewam kerdî. Êlih de nizdîyê 700 hebî cînayetê ke kerdoxê înan nêdîyar î, estî. Bi no hawa waştî ke waştişê şarî yê demokrasî û azadî bifetisnî. Travmaya ke nê cînayetan ver awan bîya, Travmaya Qirkerdişê Helebçe ra kêmêr nîya. Labelê seba ke xebatêka cîddî nêamey kerdiş, derbazî qeydan nêbîye. Helebçeya herême cînayetê ke kerdoxê înan nêdîyar î."

ROJEVA Medya
12 Çile Pêncşem 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3 Yenişehir-DİYARBAKIR

Tel: 0 (412) 224 35 93
Baskı (ÇAP):
İstanbul: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece İSTANBUL
Tel: 0 (212) 580 63 81
Adana: Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık
Yeni Doğan Mah. 2108 Sok. No:13/A Yüreğir / ADANA
Tel:0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
e mail: rojevamedya@hotmail.com



# Ji bo Muhammed kampanya



Malbata Abdulmecîd 4 sal berê ji ber şerê Sûriyeyê, ji Qamişloya Rojava derbasî Herêma Kurdistana Federal bû. Lê malbat ji bo tedawiya zarokê xwe Muhammedê 8 salî ku bi nexweşiya kalbûnê ketiye, 8 meh berê, berê xwe da Êlihê. Malbatê diyar kir ku Muhammed ji ber nexweşiya xwe nikare biçe derve û dibistanê. Ji ber vê yekê malbat ji bo perwerdehiya bi kurdî û erebî bidin Muhammed li mamosteyekî digere. Malbata Abdulmecîd ragihand ku xêrxwazekî xwe gihandiye wan û gotiye heke mamosteyek bê dîtin, ew ê bikare di warê madî de alîkariyê bide wan. Malbatê destnîşan kir ku daxwaza wan a herî mezin başbûna Muhammed û çûyîna wî ya dibistanê ye.

Her wiha astronotê îngilîz Hussaîn Manawer ê ku di 2018'an de dê biçe fezayê hefteya çûyî tevî heyetekê serdana Muhammed kir û ji bo tenduristiya Muhammed baş bibe, hesabek vekir û kampanyaya alîkariyê da destpêkirin. *ÊLIH - DÎHABER*

## Ji bo piştgiriya penaberan civîn

Hejmara Rêxistinên alîkariyê yên li Minbicê zêde ne, lê tevî vê yekê şêniyên herêmê û koçberên ku li wir bi cih bûne gelek zehmetiyan dikişînin û pêdiviyên wan ên jiyanî bi cih nayên.

Ji ber vê yekê Meclisa Sivîl a Minbicê û gundewarên wê bi 21 rêxistinên alikariyê re civînek li dar xist.

Di civînê de rêxistinên alîkariyê diyar kir ku gelê herêmê ji ber bombebarana artêşa tirk û çeteyên DAIŞ'ê gelek zehmetiyan dikişînin û ji ber vê yekê divê ji hev re bibin alîkar û piştgiriyê bidin gel. Her wiha rêxistinan destnîşan kir ku ji bo ku alîkarî li koçberan bê belavkirin divê di navbera wan û Meclisa Sivîl a Minbicê de têkilî hebe. **MINBIC - ANHA**



## Ji ber berfê nexweşxane tijî bûn

Ji ber sarbûna hewayê û berfa zêde, li Stenbolê nexweşxane tijî bûn. Li rêyên ku ekîbên şaredariyê li hemberî barîna berfê baş tevdîr negirtin, qeşa çêdibe û ji ber vê qeşayê gelek kesên dişemitin çavên xwe li nexweşxaneyan vedikin.

Li beşa Lezgîn a Nexweşxaneya Fakulteya Tibê ya Çapayê ya ku rojê herî kêm rontgena 100 nexweşan lê tê kişandin, gelek nexweş ji ber heman giliyê serî lê didin. Van rojan nexweş ji ber şikestin, westan û bêhaliyê li korîdorên nexweşxaneyan rêz dibin û her wiha tim ambulans diçin û tên.

Bijîşkekî dahîliyeyê ku nexwest navê xwe bide, got ku ji ber barîna berfê ya zêde, di çûn û hatinê de ambulans ditengijin. Bijîşk anî ziman ku divê di hewayên wisa de kes zêde dernekeve derve û baldar bin. **STENBOL - DÎHABER**





# Xaniyên kerpîç ji bo wê jiyan in

**Gundê Varagavank ku xwedî dîrokeke kevn e, beriya erdhêja Wanê gelek kes lê dijiyan. Lê piştî erdhejê ji bilî pîr û kalên gund hema bêje hemû şêniyên gund malên xwe yên kerpîç terikandin û li avahiyên TOKÎ'yê bi cih bûn**

Gundê Varagavank yê girêdayî Îpekyola Wanê, dîroka wê xwe digihîne heta ûrartûyiyan û li quntarên çiyayê Erekê ye. Li vî gundî bermahiyên Keşîşxaneya Varagavank ya ji bo ermeniyan gelekî girîng jî heye. Ev gundê ku berê aîdê ermeniyan bû piştî sala 1960'an welatiyên Miksa Wanê li vî gundî bi cih bûne. Lê vê rewşê heta erdheja Wanê ya 2011'an berdewam kir.

Li gundê ku welatî bi cotkariyê mijûl dibûn û piraniya xaniyên wan bi kerpîçan hatibûn çêkirin, di dema erdhejê de ji ber ku xaniyan xisar dît, gundiyan gund terikand û li xaniyên TOKÎ'yê bi cih bûn.

Welatiyên li gund mane jî bi piranî di ser 65 saliyê re ne. Jina bi navê Vahîde Kahraman a 75 salî tenê du mehan di xaniyê TOKÎ'yê de maye û vedigere mala xwe û niha jiyana xwe li gund didomîne.

Kahraman anî ziman ku beriya



erdhejê jinên gund dihatin gel hev, genim dihêra, bi axa gund xaniyên xwe yên kerpîç çêdikirin û wiha got: "Lê piştî erdhejê jiyana gund guherî. Piraniya xaniyan zirar dît. Gundiyan ev tamîr nekirin. Çûn li avahiyan bi cih bûn. Lê ez neçûm. Min nexwest keda xwe terk bikim. Ji ber ku di wan xaniyan de gelek ked heye. Niha ez dixwazim ev xaniyên kerpîç hemû bên tamîrkirin." **WAN - ŞÛJIN**



# Rewşa koçberên Reqqayê xerab e

Bi destpêkirina hemleya Xezeba Firatê ya rizgarkirina herêma Reqqayê ji çeteyên DAIŞ'ê, bi hezaran şêniyên Reqqayê ji herêmên di destê çeteyan de reviyan û xwe gihand cihên di bin ewlehiya şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê de. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Girê Spî yekser xwedî li koçberan derket, ji wan re kampek li bakurê bajaroka Eyn Îsa vekir û li gorî derfetên heyî alîkariyê pêşkêşî wan dike.

Kamp ji 30 konên ku Rêveberiya Xweser û Rêxistina Kar û Barên Penaberan a Neteweyên Yekbûyî pêşkêş kirine, pêk tê. Komîteya Kar û Barên Koçberan a girêdayî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk bi derfetên xwe av, xwarin û pêdiviyên zivistanê ji koçberan re peyda dike. Lê ji ber derfetên kêm hemû pêdiviyên koçberan bi cih nayên.



Endamê Rêveberiya kampê Ehmed Hemê diyar kir ku ew nikarin hejmareke din pêşwazî bikin û wiha axivî: "Em li gorî derfetên xwe alîkariya koçberan dikin, lê ev yek têrê nake. Carinan hin rêxistin serdana kampê dikin û soz didin ku ew ê alîkariyê pêşkêşî koçberan bikin. Lê ew alîkarî jî pir kêm e."

Hemê destnîşan kir ku pêwîstiya kampê bi pêdiviyên tenduristiyê heye û ev tişt got: "Di kampê de tenê navendeke tenduristiyê ya Heyva Sor a Kurd heye. Lê derman û alavên tenduristiyê kêm in, ji ber vê yekê gelek nexweş nayên dermankirin. Tevî ku em bi gelek rêxistinên alîkariyê re ketin nav têkiliyan de jî, lê heta niha alîkarî pêşkêş nekirine." Her wiha Hemê herî dawî bang li rêxistinên mirovî û alîkariyê kir ku destekê bidin koçberên Reqqayê. ***REQQA - ANHA***

www.arsivakurd.org